

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatolîyê

83
2022

bîrnebûn

Newroz we pîroz be!





Tidskriften utkommer 3 nummer per år.
Çar mehan carekê derdikeve.
Utges av Apec Förlag AB
hejmar 83 / 2022
Ansvarig utgivare: Alî Çiftçi
Editor: Alî Çiftçi, Heciyê Gulê, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê
Alî Çiftçi, Altun Başaran, Seyfî Dogan, Mem Xelîkan,
Hesenê Metê, Xelîl Şêxbizîni, Zöhre İscan, Ferîdûn,
Muzaffer Özgür, Hîzir Akbîna, Hayrettin Güven,
Cutyar T. Hawramî, Seyîdxan Anter, Nuh Ateş,
Mehtab İdelfî, Xîzan Şîlan, Ehmed Milan,

Belavkirin / Distribution:
Ewropa: Muzaffer Özgür
Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Numra kontoya li Swêdê:
(Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224
Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê
APEC, "Bîrnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden
BIC/SWIFT: DABASESX
IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874
Çap / Bask: Apec-Tryck AB

Biha/Pris:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 10 TL
Abone ji bo du salan
Swêd: 400 SEK -Almanya 50 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Türkiye
İstanbul
Selahattin Bulut/Medya Kıtapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Adress
Navnîşana li Swêdê
Apec
Mjölmarstigen 1
SE 163 41 Spånga/Sverige
E-post: info@apectryck.se
Internet: www.birnebn.eu

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tîn,
sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan
nayên vegeandî.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Zîman li Almaniyayê piştgirên kovarê ne.

bîrnebûn

83

2022

Wêneyê berga pêşîn: Runak Resulpur

ISSN 1402-7488

Naverok

Ji bîrnebûnê	4	Ali Çiftçi
Mekteba şemîyê	7	Zöhre Iscan
21ê Sibatê Roja Zimanê dê	10	Ali Çiftçi
Sêva Mêxekrêj	14	Seywan Saedîan
Cihanbeylî û êşa 52 rojan -2-	16	Muzaffer Özgür
Deq	20	Mehrab Îdelî
Xerîbî	27	Mem Xelîkan
Kilamên me-III, Mala bavê min birano!	28	Mem Xelîkan
Qerfo / Quto	32-33	Seyfî Doğan
Gotinên pêşîyan	34	Altun Başaran
Janêşên bédeng	36	Xîzan Şîlan
Li hêla pirê	38	Heinrich Böll (Wergera Nuh Ateş)
Helbest	41	Seyfî Doğan
Kurteserpêhatî -2, Xelê Kuto	42	Îhsan Türkmen
Mîn kurdê Anadol îm	46	Xelîl Şêxbizînî
Helbest- duh xwen bû	47	Seyfî Doğan
Dengê bavê min-III	48	Hayrettin Güven
Yekemîn car navê Kurdistan kengê peyda dibe	50	Ehmed Mîlan
Yek ji me	54	Seyîdxan Anter
Ebdulkarîm Kerkûklîzade	56	Cutyar T. Hawramî
Henek	63	Ferîdûn
Erdê pîrozwer	64	Pär Lagerkvist/Wergera Hesenê Metê
Pêkenok: Hec Mêrko	72	Hîzîr Akbîna
Ji çarînên Omer Xeyam	73	Wergera ji farisî: Ehmed Mîlan
Romana <i>Şîbera şeva tarî</i>	75	Ali Çiftçi

Ji Bîrnebûnê

Xwendevanên birêz, me saleka din a bi pandemîya ”*vîrusa coronayê*” li pişt xwe hişt. Û bi hêvîya ku ev pandemî di vê biharê de bi dawî be, yan jî sivikbûna xwe çêbe. Nîşaneke xêrê ye ku li piranîya welatên Ewropayê jî sînorkirinên jiyanî rojane hatine rakirin. Vê pandemîyê helbet bandorek li jiyanî merîyan ya civakî, siyasî û aborî kir. Encama wê dê li pêşerojê çî be, em ji niha de rind nizanin! Pandemî li cîhanê neheqîyan êşkere dîkin û ev yek dibe sedema alozî û pevçûnên siyasî jî. Ji bûyerên ku niha li seranserê cîhanê dibin ev yeka xuya dike.

Li gor lêkolînên kovara *The Economist*, ku li ser pandemîyên berê hatine nivîsîn, destnîşan dîkin ku bandorên siyasî û aborî yên pandemîyên berê, li ser jiyanî civakî, siyasî, aborî û teknîkî mezin in. Piştî pandemîyên sawên giran, piştî şerên cîhanî, pêşketina aborî jî hema hema her gav li pey tê. Lê gelek kesên ku ji van karesatan rizgarbûyî jî hes-tên bêewlehîyê li wan çêbûne û rastî alozîyên siyasî û aborî bûne. Ji derveyî van rûdanên têkçûnên

cîyên kar, bêkarî jî zêde bûye. Herwiha bi xwe ra peydakirina teknîka nû û pêşketin jî anîne.

Li welatê me ev alozîyên aborî bandoreka mezin li jiyanî însanan kiriye. Li gel vê bêkarî û belan-gazîyê, nijadperestîya li Tirkîyê jî zêdetir bûye! Em vê pir vekirî di encama dersa hîlbijartî ku Tirkîyê jî bo xwayinkirinê be jî, dibînin. Encamên îsal de rêjeya hîlbijartinê li gor 2012an pir daketiye. Di mufredata wezereta perwerdeya neteweyî (MEB) a Tirkîyê ku cara siftê dersa kurdî wek derseka hîlbijartî cîh girtîbû, di heman salê de ji 28 parêzgehan 18 847 şagirtan serî li dersa hîlbijartî ya kurdî kiribûn, lê di salên pişt re eleqe kêmtir bûye.

Encama ya îsal jî li gor medya tir-kan li 7 parêzgehan: Diyarbekir (3265), Cîlemêrg (1045), Mêrdîn (2616), Mersîn (450), Şîrnax (335), Riha (287) û Ankara (21) li ser hev 8019 serlêdan bûne.

Li Anadolîyê, tenê li parêzge-ha Ankarayê 21 serlêdan bûne. Li parêzgeha Konyayê ku piranî kurdên Antolîyê li derûdora vê parêzgehê dimînin qet serlêdan nebûne. Dema me ji hinek mal-bat, kesên nas û derûdora xwe

re pîrsa vê kir, bersiva ku me wergirt, ya hemûyan ev bû ku ji tîrsa, kesî nexwestîye kurdîbûna zarokên xwe eşkere bikin.

Zimanê kurdî li bakurê welêt û herwiha li Anadolîye ber bi wendabûnê ve û xelkê kurd jî li ber jenosîda çand û zimanê ye.

Di vê dema înternetê de zarokên kurd jî her alîyî ve ji teknîka nû ku bûye parçeyeka jiyana rojane bêpar in! Di rewşa îro de tiştên ku li bakurê welêt rûdide, helbet bandora xwe li kurdên me yê derveyî welêt jî dike. Lê li derveyî welêt, bo nimûne welatên li Ewropayê, derfetên parastina nasname û pêşxistina zimanê kurdî hene. Li piraniya dewletên Ewropayê mafê dîsa zimanê dê heye. Swêd yek ji wan welatan e ku ji salên 1980î vir ve zarokên kurdan yê ku dixwazin, dîsa zimanê dê werdigrên.

Bi serpereştîya Waqfa Kurdên Anatolîya Navîn, *Stiftelsen-KAN* ev demek e, mekteba şemîyê bi kurdî li bajarê Stockholmê, li taxa Botkyrkayê dest pê kiriye. Niha li bajarê Göteborg û Gävle yê jî dîsan bi serpereştîya waqifa KANê mektebên şemîyê vebûne. Mamosta Zöhre Iscan li ser mekteba şemîyê û aktîvîteyên wê di vê hejmarê de nivîsîye.

UNESCOyê Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî, 21 sibatê, ya îsal wek roja hînkirin û pîrrengîya zimanan, bi temaya îsal a *"Ji bo hemwelatîya global zimanên herêmtî, ji bo zanistê"* bi nav kiriye. Bi munasebeta vê rojê bi sernivîsa *21ê sibatê roja zimanê dê ya navneteweyî* hatiye nivîsîn.

Sêva Mêxekrêj, sêveke xwezayî ye û kevneşopîyeka kurdan e ku ber bi wendabûnê bû. Seywan Saedian ji Rojhilat, ev wek projeyeka hunerî ji sala 2003an vir ve li Başûr û Bakurê welêt û niha jî li welatên Ewropayê ji bo ku ji nû ve ev kevneşopîya bê jiyandin her sal di hefta valentinayê, 14ê sibatê, roja evîndara de vê wek çalakîya bi navê *"Valentîna kurdî"* di-meşîne. Bi kurtenivîsekê me Sêva Mêxekrêjê daye nasandin.

Bîranînên bi êş yê jineka ji rojavayê Tirkîyê, Cîhanbeylî û êşa 52 rojan beşa 2an a Muzaffer Özgür di vê hejmarê de jî berdewam e.

Deq, navê giştî yê nîşan û nîgarên ku li ser çermê mirovan tînin çekirin e. Deq ji dema neolîtîk heta niha li seranserê cîhanê berdewam e. Birêza Mehtab Îdelî li ser vê mijarê hem dîroka wê û hem jî di nav kurdan de bi taybetî li navçeya Anadolîyê

bi çi rengî heta niha hatiye, bi wêneyan lêkolaye.

Birêz Dr. Mem Xelîkan bi rêzenivîsa xwe ya *Kilamên me îcar kilama Mala bavê min, birano* ji arşîva Serbulent Kanat wergirtîye û bi kurteşiroveyekê nivisîye.

Gotinên pêşîyan diyardeyên kevn ên avrasyayî û afrîkayî ne. Altun Başaranê hinek ji gotinên pêşîyan ji bo vê hejmarê berhev kirîye.

Xizan Şîlan bi helbesta xwe ya *Janêşên bêdeng* regekî din daye vê hejmarê.

Nuh Ateş, çîrokeka almanî ya Heinrich Böll a bi navê *Li hêla pirê* wergerandiye.

Îhsan Turkmen di zîncîra kurteserpêhatîyên xwe de îcar li ser *Xelê Kuto bi zimanekî xweş* nivisîye.

Xelîl Şêxbizinî bi kurdîya şêxbizinî helbestek hêja bi navê *Min Kurdê Anadol îm* helbestek nivisîye.

Hayrettîn Güven serpihatîya zaroktîya xwe ya bi navê *Dengê bavê min* bi beşa sisêyan berdwam e.

Seyidxan Anter bi sernivîsa *Yek ji me* kitêba *Bîranînên min* a Amed Tîgrîs daye nasandin.

Ferîdûn bi heneka xwe ya *Remo û Hes*, Seyfî Doğan bi kurtehelbestên xwe yên bi navên *Qerfo û Quto* regekî din dane vê hejmarê.

Birêz Ehmed Mîlan di çavkanîyên farisan de navê Kurdistanê li çi demê peyda bûye an hatiye bikaranîn bi ser nivîsa *Gelo bo yekemîncar navê Kurdistan di çi demê da peyda dibe?* nivisîye.

Cutyar T. Hawramî bisernivîsa *Ebdulkerîm Kerklûklîzade, xwedîyê îmtiyaz û rêvebirê kovara "Rojê Kurd"* lêkolîneka balkêş ji bo kovara me kirîye.

Hesenê Metê ji romana Pär Lagerkvist a bi navê *Det heliga landet* parçeyek bi sernivîsa *Erdê pîrozwer* ji swêdî wergerandiye kurmancî.

Hizir Akbîna bi pêkenoka bi navê *Hec Mêrko*, Ehmed Mîlan bi wergera ji çarînên Omer Xeyam tevli vê hejmarê bûne.

Bi hêvîya ku em ê bi dilekî pak û jiyaneka aram bihara 2022an bi hev re derbas bikin ji niha ve, 8ê Adarê, roja jînan û Newroza we gîştikan li ser navê koma hevkarên kovarê pîroz dikim. Bimînin di xêr xwaşiyê de heta hejmara bê!

Alî Çiftçî

Rojeka mekteba şemîyê bo "Valentîna Kurdî"

Zöhre Îscan



Sêva Mêxekrêj kevneşopîyeke kurdan e ku li ber wendabîyînê bû. Hunermend Seywan Saedian bi bîranî û li ser projek çêkirîye. Mane wê kesên ji evîndara xwe bixeyîde ji bo aşitî, sêvan bi qurnafla dixemlîne û ji evindara xwe ra dişîne.

Ew roja ku em pê re bûn, çî rojeka xweş bû! Li salona mezin a dibistana şemîyê ya Weqifa KANê, li Stockholmê bûn. Li dibistana me heger hûn hevdu

nenasin jî silav û xêrhatina hev dîkin. Di çêkirina sêvên qurnefilê yên bîhnxweş de, dê, bav û zarok ê bi heyecan û coş bûn. Sêven tèn çêkirin ku jê re sêven evînê jî tê gotin yek ji kevneşopiyên kurda bûye. Ev sêvên evînê yên ku bi rastî pewist e ku di nav kurdan da bêne belav kirin. Çanda kurd ku min nedizani.

Min wek kurd, cara yekem ê ku bi saya vê dibistanê da naskiri bû. Hunermendê kurd Seywan



Seedian ew serpêhatî li dibistanê ji me re saz kir û bi weqfa KANê ve diyar kirin ku di roja evîndaran de *Valentina Kurdî* bi dayîna Sêva Mêxekrêj çêkin.

Belê, em dizanin ne hêsan e ku meriv bi peyvan baxşandinê xwe bixwaze, yek nîşanek ji axaftinê bêtir ji we re dibe alîkar ku hûn hestên xwe diyar bikin, çî rind!

Em bi dost û hevalên xwe va li dora masê rûniştîbûn û me Sêva Mêxekrêjê çêdikir. Di serê min da pirs derbas dibûn. “ew çanda kurda min çima qat nebihîsti bû? Ew ji kingê pê da peyda bûbû? Beşdar bi kîjan hestan çêdikinê? Erê tilîyên min dêşiyar ji bo daynina qurnafilê li sêve lê evîndarî jî zehmet bû...”

Min li derûdore xwe mêzekir ku hemû dilgeş in, ru bi ken in, her kes bi baldarî, bi sêva xwe ve mijûl dibû. Ji çar aliyên Kurdistanê kes hebûn. Ew çî fersendeke baş ê ku malbatên ji ber sedemên curbecur koçî welatekî din kirî bûn li vê dibistanê dikarî çanda xwe biceribînin û nîşê xwe yê nû hînî çanda xwe bikin û kevneşopiyên xwe bidomînin. Zarokên me sêven xwe dixamlandin, bi dê û bavê xwe ra dipeyivîn.

Lêkolîner dibêjin ku zarokên





Hiwa Khatib û Rustam Mirlashari

bi zimanê xwe yê zikmakî deng
dikin û bi kevneşopîya xwe me-
zin dibin, dikarin di
pêşerojê de baştir bi-
serkevin û wê demê
dikarin zêdetir hay
ji mirovatî, maf û
hezkirinê hebin.

Hevala min a hêja
li kêlaka min rûnişti
bû, digot: "Ma hûn
dikarin xeyal bikin ku
nifşek tenê bi evînê mezin dibe û
tu zarok nizanin şer an çek çi ne?
Ji ber ku evîn evînê distîne."

Hunermendên muzikê yên
navdêr Hiwa Khatib û Rus-
tam Mirlashari bi
kilamên xwe yên
xweş dilên me zîz
dikirin.



Kurd bin bê go-
vend nabe! Roj bi
govend û coşeke
mezin berdevam
kir. Di herî dawiyê
de keçika min hat

û got: "min sêva xa ji atke xa ro
çekir."



Stranbêj Kanî, Mizgîn û Hemrîn

Ev wêneyê monomenta
bîranîna şehîdan li Daka,
Bangladeşê ye. Xelkê bengalî jî
bo ev kesên ku 21ê sibata 1952an
canê xwe jî bo zimanê dê dane,
rêzdariya xwe nîşan didin.



21ê SIBATÊ ROJA ZIMANÊ DÊ YA NAVNETEWÊYÎ

Di 21ê sibata 1952an de xwendekarên bengalî li rojhilatê Pakistanê jî bo bikaranîna bengalî ya xwemalî wekî zimanê neteweyî li gel zimanê urdu bê bikaranîn dest bi protestoya kirin. Polîsan bi gaza îsotê êrîşî xwendekaran kiribûn û piştî dabûn ber gulebaran. Di encama êrîşa polîsan de Abdul Cebbar, Abdus Selam, Rafîq Uddîn Ehmed, Abdul Berkhat û gelek xwendekarên

din mirin. Ya mayî dîrok e ku bû sedema damezrandina welatekî nû ya bi navê Bangladeş, welatekî ku xwedî zimanê bangalî ye.

Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî, roja hînîkirin û pîrrengîya zimanan, bi temaya îsal a "Ji bo hemwelatîya global zimanên herêmî: Ji bo zanîstê" jî alîyê UNESCOyê ve hatiye bînavkirin.

Roja Zimanê Dayîkê ya Navneteweyî, roja hînkirin û pirrengîya zimanan, bi temaya îsal a *"Ji bo hemwelatîya global zimanên herêmî: Ji bo zanistê"* ji alîyê UNESCOyê ve hatiye binavkirin.

Roja Zimanê Dayîkê ku di sala 1999an de bi armanca ku bibîranîna mafê hemû însanan bi awayekî azad bi zimanê xwe yê dayîkê deng bike û binivîse hat hilbijartin.

Ev roj li hemû cîhanê bi çalakîyên cuda yên wekî konferans, konser, semîner û hwd tê pîrozkirin. Zêdebûna hişmendîyê derketiye holê ku ziman di pêşketinê de, ji bo pirrengîya çandî û diyaloga di navbera çandên de, di heman demê de di xurtkirina hevkarîyê, avakirina civakên zanîne yên têkildar û parastina mîrateya çandî de roleke girîng dilîze.


Zimanên herêmî ji piranîya zimanên ku di qada zanistîyê de li seranserê cîhanê tên dengkirin pêk tên. Her zimanekî herêmî li gor çand û mîrata xwe ya herêmî zanistîyê vedihewîne û di navbera neslan de benda herî girîng e. Ew jî yên herî zêde îro di xetereyê de ne. Nehîştina perwerdeya bi van zimanan tê wateya dervehiştina

kesên ku bi van zimana deng di-kin ji mafên bingehîn û zanistîyê bêpar hiştine.

Nizanim we kalkotî bihîstiye? Ev bi tenê yek ji wan zimanan e ku niha li ber wendabûyîne ye. Kalkotî tenê li gundekî li herêmen sînorê bakurê rojavayê Pakîstanê ji alîyê çar hezar kesî ve tê dengkirin. Li gor statîstîkên UNESCOyê di cîhanê de zêdetirî şeş hezar ziman hene ku piranîya ji wan di bin tehdîta wendabûnê de ne.

Dîsa li gor UNESCOyê di roja me ya îro de nêzî nivê şeş hezar zimanên li cîhanê tên dengkirin, dikarin heta dawîya vê sedsalê wenda bibin. Ji sedî 96ê hemû zimanên li cîhanê îro bi tenê ji sedî 4ê nifûsa cîhanê tên dengkirin.

Di roja Zimanê Dayîkê ya îsal de wê mijarên têkildarî zimanên herêmî û zanistê ve bîr dagirtin. UNESCO di wê bawerîyê de ye ku parastina zimanên herêmî û zimanê dayîkê di warê perwerde û zanistê de pêwîstî bi cihêkî zêdetir heye, ji ber ku têgihiştineke baştir



Ev wêne li Kolkataya
Hindistanê ye ku beşek ji
xelkê wir bi bengalî deng
dikin. Gelê Bengalî yên
ji Hindistanê vê rojê bi
serbilindî û rêzdarî pîroz
dikin.

a zimanan, tevkarîyeke girîng e ji bo xebata li dijî gelek zehmetiyên gerdûnî.

UNESCO, perwerdeya du an jî pirzimanî ya li dibistanên seretayî wek şertekî bingeîn ji bo hînbûna berdewam a zarokan diparêze.

Gotina zimanê dê

Ji aliyê pîsporên zimanan de gelek pênaseyên cuda yên têgeha zimanê zikmakî hatine kirin, wek zimanê ku meriv yekemcar fêr dibê, zimanê ku mirov herî baş dizane, zimanê ku mirov herî zêde bi kar tîne, zimanê ku bi nasna-

Peyama dîrektorê giştî ya UNESCOyê Îrina Bokova:

Bi minasebeta vê rojê, ez li seranserê cîhanê û li her derê, di sîstemên perwerdeyê û îdarî de, di derbirînên çandî û medyayî de, di qada ezmanî û bazirganîyê de bangewazîya qebûlkirina potansîyela perwerdeya pîrzimanî dikim.

meya meriv re têkildar e. Ev gotin wekî zimanê yekemîn ku mirov ji malbata xwe an jî ji derdora nêzîk fêr dibe tê îfadekirin. Li gor van ronîkirin û agahîyan, em dikarin wê wek zimanê yekem a nasnameya kesayetî bi nav bikin.

Zimanê dê bi gelemperî zimanê nasnameya kesayetîya etnîkî ya dê û bavan e. Di heman demê de ji aliyê sembolîk ve girêdana herî girîng e ku nasnameya civakê pêk tîne.

Ji ber vê yekê, ziman tîni tepisandin, parastin an jî pêşvebirin, ji ber ku mirov zimanekî weke hêmaneke çandî dibînin ku nîrxê ku ji bo tevahîya nîfûsê hatiye dayîn sembolîze dike û hesta hevpar a çarenûsê parve dike.

Niha li gor van zanyariyên UNESCOyê dema em rewşa zimanê kurdî, bi taybetî ji bo kurdên bakûr û Anatolîyê binêrin

pir vekirî xuya dike ku kurdî jî di nav vê metirsîya ku ber bi wendabûyîna de ye. Hêdî ne hewce ye em li vir dûr û dirêj li ser vê şorê dirêj bikin. Di 2012an de li Tirkîyê¹ ev deh sal in mafê fêrbûna zimanê dê, herçiqas hindik be jî, bi rêya yasayê hatiye dayîn ku dê û bav bixwazin zarokên wan dersa kurdî werbigrên, wek dersa hîlbijartî dikarin hîlbijêrin. Îsal jî li seranserê welêt agahdarî hat belavkirin ku herkesê bixwaze perwerdeya zimanê dê bo zarokên xwe, dikare hîlbijêre. Em dibînin ti talebeka pir zêde nawiye! Ji ber ku hîn jî li Tirkîyê û li welêt kurdên xeter e û ti statûyeka zimanê kurdî tune!...

Niha tenê rêyek ma ye ku ev ziman wenda nebe. Ev jî divê ji aliyê dewletê ve perwerdeya zimanê dê mecbûrî be û ji zimanê kurdî re statûyek bê dayîn!...

¹ İlköğretim ve Eğitim Kanunu ile Bazı Kanunlarda Değişiklik Yapılmasına Dair Kanun, <http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2012/04/20120411-8.htm>.

Sêva Mêxekrêj

Projeyek hunerî ya Seywan Saedian





Sêva Mêxekrêj, sêvekî xwezayî ye û kevneşopîyeka kurdan bûye. Gavek sêvek tê mêxekrêj kirin, zêdetir ji sed salan dimîne û bihna xweş ya wê her tim heye.

Ew wekî sembola evîn û aştiyê di nav kurdan de hatiye bikaranîn. Piranî ji boy du mebestan ev sêv çêkirine.

Ya yekem, gavek keçikekî ji kurrikekî hezkiribe û nikaribe evîna xwe jê re bêje, sêvekî mêxekrêj kirîye û jê re şendîye û bi wî avayî hestên xwe êşkere kirîye.

Ya duduyan, dema ku du kes an du evîndar ji hev aciz dibûn, yek ji wan sêvek mêxekrêj çêkirîye û ji bo aştiyê daye kesê beramber.

Ev kevneşopî berve jinavçunê bû hêdî hêdî dihat ji bîr kirin.

Di sala 1999an de gavek Seywan Seîdiyan gel dêya xwe aciz bûye, ji boy aştiyê dêya wî sêvek mêxekrêj

jê re dişîne. Piştî ku Seywan ev sêva balkêş nas dike, biryar dide ku di pirojeyên hunerî ya xwe de bi cih bike û ji nû ve li astên netewî û navnetewî bide naskirin.

Ew xebatên xwe ji boy wê armancê ji sala 2003an ve despêkirîye û heta niha jî didumîne. Ev piroje bi aksiyonên hunerî yên cuda, heya niha li Kurdîstanê, Rojava, Îran, Irak, Turkiye, Belçika, Almanya, Swêd û Îngilîstanê rêveçûye.

Ji boy pirojeyê sê pêvajoyên hatin destnîşankirin.

Ya yekemîn: Vejîn bu ku bextewer ji çend salên despêkê de gehîşt armanca xwe.

Ya duyemîn: Bi neteweyîkirinê ku ev jî heya astekî baş serketî buye û niha li her çar perçeyên Kurdistanê tê naskirin û çêkirin.

Ya sêyemîn: Bi navnetewî kirina ku Seywan hîn jî li ser dixebite.

Bîranînên bi êş ên jineka ji rojavaya Tirkîyê

Cîhanbeylî û êşa 52 rojan

-2-

Muzaffer Özgür

Bi ronahîya rojê re em ji xewê rabûn. Me xwe amade kir. Piştî xurîniyê me xatirê xwe ji otêla ku em lê di-manî xwast û bi teksîyekê derketin ser rêya merkeza rawestgeha otobosan.


Di kolanên bajêr de gelek însan hebûn. Erebe hespan, wesayîten biçûk yên bi sê tekeran deng dabûn hevdu. Texsîya me di ber hepisxanê re derbas bû. Tirs û pirsan dan dû hev di serê min de.

Em li der bûn û azadî pir xweş bû. Di paş dîwarên bilind û qirêj de kesên diz, qetîl, bêşeref hebûn, lê kesên bi derd û kul, belangaz

û bêkes jî hebûn. Li gor min û xemgîn bûm...

Dûre em di ber dibistanekê re derbas bûn. Dibistana navîn bû. Li ber derî şagirt bi keç û lawan kom bi kom diketin hundir. Kêfa min ji wan re hat.

Dema teksîya me rast çex bû li aliyê çepê mezêlê bajêr hebû. Min dît ku bavê min destên xwe vekirin û bi dengê bilind dest bi dua kir: „*Essalemû aleykê ya Ehlel Qubur*“. Dûre bi dengê nizm berdewamîya duaya xwe kir. Em demekê çûn. Li meydana xwe çep



çexbûnî û min dît ku li doralîyên rê gelek polîs hene. Dûre jî nivîseka mezin li ser dîwarê bîneyekê hat ber çavên min. „Merkeza polîs a bajêr“. Çend deqan bi şunda jî em gihiştinî rawestgeha otobosan.

Em peyabûnî û me tiştên xwe kişand hundir. Hinek kesan bangî rêwîyan dikirin. Yekî bang dikir: „Eskişehir, Bursa, Kocaeli, İstanbul“, yekî din digot: „Adana, Antep, Urfa, Diyarbakir“. Galleqala wan di hundirê bîneyê de belav dibû. Yek ji wan nezî me bû got: „Hûn kuda terin, otobosên me amade ne!“ Bavê min bersiv dayê: „Em ê herin Cîhanbeylîyê“ Xwe avêt ber me û ket pîyê bavê min, ew kişand û bir cîhê biletkirinê. Min dûredûr ve li wan mêze kir. Bi rê de bang jî dikir. „Ankara, Kulu, Cîhanbeylî otobos demeka kin de radibe. Werin werin!“ Bavê min vegerîya hat, biletên me kirîbûn. Bi alikariya du kesên ji biletfiroşan, me tiştên xwe li otobosê bar kir û li otobosa firma Kontaşê sîyar bûn.

Demeka kin de jî rêwîtiya me dest pê kir. Li gor agahdariyan 100 km rêya me hebû. Em bi kelecane bûn û qet deng ji me

dernediket. Deşt Konyayê mezin bû û rêwîtiya me berva bakur berdewam kir. Çol û banîyan re derbas bû otobosa me. Qet daristanek an jî cîhekî heşinahî lê hebe, tunebû. Ne wek bajaroka me bû deşt Konyayê. Ziwa û hişk bû. Saetek bi şunda em li rawestgeha Cîhanbeylîyê ji otobosê pêya bûn. Dema ez ji otobosê ningê xwe bidim ser erdê, min di hundirê xwe de „Bismillahîrahmanirrahim“ got. Bi gava yekemîn ji bo min jîyaneka nû li vir dest pê kir. Me tiştê xwe bi amenetî teslîmî buroya rawestgehê kir.

Min serilêdana xwe li buroya Serokê Tendirûstîyê da û kaxîzên xwe teslîm kirin. Em bi ereba Buroya Tendirûstîya bajaroka Cîhanbeylîyê çûn nexweşxanê. Nexweşxane î biçûk bû. Dema em ketin hûndir, çend kes li ber derîyê muayenexanê li pê bûn. Jineka dergûş di hembêzê de li ser kursîyekê rûniştîbû û nalenala dergûşê dihat. Bîhna dermanan ket pozê me. Kesê em birin, rêberê me bû. Derbasî odeya doxtor bû, silav dayê û em jî dawetî hundir kirin. Doxtor bi dilgermî pêşvazîya me kir. Rêberê me, em dan nasîn û ji me

re çay hat gotin. Doxtor em ji bo kar û nexweşxanê agahdar kirin. Tirsê bavê min, ka cîhêkî ku ez lê bimê hêbû an na? Lojman hebû an na? Xanî hebû an na? Doxtor bi zimanekî nerm got: „Lojmana me heye, niha hemşîreyek bi tene dimê, tu jî dikanî li ba wê bimîn!“ Bavê min şa bû. Doxtor dest avêt telefona ser masa xwe û bangî hemşîreyê kir û em dan nasandin. Xerîbî zor e, bêkesî, bêynas li bajarekî yad û dûr. Ew jî bi tenê bû. Gelek şa bû. Bi dilgermî me hevdu maç û hembêz kir!

Bi alîkarîya rêberê me, bavê min tiştên min anîn lojmanê, lojmana ku çend salan bibiya mala min! Di lojmanê de du odên raketinê, salonek, aşxanê û cîhê serşûştinê, avdestxane hebûn. Oda ku ez lê bimê vala bû. Min dest bi paqijîya oda xwe kir. Bavê min li ser kaxizekê hemû kêmasî nivîsandin û daket çû bajêr û kêmasî kirîn. Doxtor ji nexweşxanê somyek şand û me ew jî bi cîh kir. Bavê min got: “Qîza min, birêz Doxtor kesekî baş e, êdi çavê min li paş namên. Ez ê bi dilekî rehet vegerim mal. “Ez kenîyam. Me him sohbeta xwe dikir him jî paqijîya malê. Di wê

navberê de doxtor ji me re xwarina nîvro jî dabû şandin. Min çayek jî dabû ser. Jîyana min a li bajaroka deşta gola xwê bi kêfxweşî dest pê kiribû.

Dema em rûniştin me çay vexwar, bavê min got: „Qîza min dema min kêmasî dikirîn malbatek hat dûkanê û wan di nav hev de bi zimanekî din deng dikirin. Ez mat mam, min qet tiştek ji wan fahm nekir.“ Min got, „dibe ku turist bin, xerîb bin.“ „Na, na gundî bûn bawer im.“ got bavo. Ez jî şaş mam, di merkeza welêt de, li deşta Konyayê gundî bi zimanekî din xeber didin û em qet jê fahm nakin, Xwedêyo ew kî bûn? Ew çi bûn? Me nekarî em bersiva meroq û kelecana xwe bidin.

Roja din bi şîn û çavên şil bave min xatirê xwe ji me xwest û vegeirîya mal. Min jî dest bi kar kir. Doktor bi min karkarên nexweşxanê dan nasîn. Karûbarê min êşkere kir. Du heftan ez ê bi hevala xwe re kar bikime û dûre yek ji me sibê zû, yek ji me jî nîvro bi şûnda dest bi kar bike. Carcaran jî nobeta şevê heye. Çend doktorên li qezê hene nobedarîyê dikan û li gor daxwaza wan hewce

be yek ji me wê bibê nobedar.

Di roja min a yekemîn de li nexwaşxanê min bi çavên xwe dît û bi guhên xwe jî bihîst ku li vir însan hene ku bi zimanekî xerîb deng dikin û ez kelîmeyekê jî jê fahm nakim. Xwedêyo, bavoo, dayêêê! Ew çi ziman e? Dema tirkî deng dikirin jî gotin bi devokeka din digotin. Di nav kesên tîr nexweşxanê de nexwaşên tirk jî hebûn. Lê yên bi zimanekî ez qet jê fahm nakim zêde bûn. Jin bi cil û bergên qet min di jiyana xwe de nedîn dihatin. Xemilandî, çavreş, xweşik û bedew. Keçik serqot, porên dirêj, cilên rengîn! Mêr bi simbêlên qeytanî û sîngvekirî, xortên wan jî ji xwe xweş. Min nekanî ji kesekî bipirsîya jî. Roja yekemîn ji min re derdek çebûbû!

Dema êvar bû û em çûn mal ez ji meraqan bihecîbûm. Min ji hevala xwe re got: „Pirseka min heye lê ez ditirsim!?” Hevala min a delal kenîya û got: „Çima ditirsî xwuşka min, kerema xwe bipirse,

ka çi dixwazî bizanî.“ Min pirsî: „Hen însan bi zimanekî din deng dikine, ew çi ziman e? Ew kî ne? Hemwelatîyê tirkîyê ne lê, zimanê wan çima cûda ye?” Bersiva ku min bihist ez şaş û mat kiribûm. „Li vir kurd hene. Zimanê wan jî kurdî ye. Piraînya gundîyan kurd in. Eşîr bi eşîr gund hene.“ Ez şaş mabûm!

Dema îlona sala 1980yê ez li dibistanê bûm leşkeran dest dabûn ser hukimdarîya welat û di dersa leşkerîyê de mamostê me serleşkerêk bû û min cara yekem ji wî navê kurdan bihîstibû. Lê min qet nebihîstibû ku li Konyayê, li deşta Anatolîyê gund û eşîrên kurdan hene. Li deşta Konyayê çi dikirin? Kurd, tirkên bi zimanekî din deng dikin bûn û li çiya û banîyên rojhelata Tirkîyê dijîyan.

Kurdên ku min li Cîhanbeylîyê hîro bi çavên xwe dîn û nas kirin modern bûn û wek min bûn. Cil û bergên wan ji yê me cûdatir bûn, hemû ew bû.

(Berdewamî hêye)



DEQ

Mehtab Îdelî

Deq, navê giştî yê nîşan û nîgarên ku li ser çermê mirovan tên çêkirin e. Deq bi kêrî ji dema neolîtîk heta niha li seranserê cîhanê pratîka wêr kirin Wekî mînak çermê parastî yê mûmyakirî, hunera kevna û tomarên arkeolojîk tene xuyakirin. Hem hunera kevna û hem jî vedîtînen arkeolojîk ên amûren deqê yê gengaz destnîşan dikin ku deq hêla serdema paleolîtîka jorîn ve li Ewropayê hatî kirin. Lêbelê delîlên rasterast ên ji bo deqkirina li ser çermên mirovên mûm-

yakirî tenê heya hezarsala 4an a BZ dirêj dibe. Keşfa herî kevn a çermê mirovê deqkirî heta îro li ser laşê Otzi yê qeşayî hatiye dîtîn. Laşê Otzi sîh sal berê (1991) di binê cemedê de li çiyayên Alpê yê li ser sînore Avusturya-Îtalyayê hate dîtîn. Ew mirov, tê texmînkirin ku di navbera salên 3370 û 3100î de û di dema nêçîrê de miriye. Navê “Otzi The Ice Man” li wî kirin. Li ser laşê wî 61 tattoo hene. Li gor encamên tespîtkirinên zanyaran, hatiye dîtîn ku ev tattoo ji bo mebestên tenduristîyê hatine çêkirin. Pênc hezar sal şûnda, hat kifş kirin ku



Otî bi xêra tatoyan ji newxêşîya osteoporosê bêpar maye. Mûmyayên deqkirî yên din bi kêmî ji 49 şûnwarên arkeolojîk di nav de cihên li Gronland, Alaska, Sîbîrya, Mongoliya, rojavayê Çînê, Misir, Sûdan, Filîpîn û Andê de hatine dîtîn. Di nav wan de Amunet, Keşeya Xwedawenda Hathor a ji Misira Kevnar (z.2134-1991 BZ) gelek mûmyayên ji Sîbîryayê di nav çanda Pazyryk a Rûsyayê û ji çend çandên li seranserê Amerikaya Başûr a Pre-Kolumbî jî hene. Û wekî din ji belgeyên dîrokî tê fehmkirin ku ev kevneşopî li Yewnanistana kevnar û li Romayê û gelek deverên din yên cîhanê jî hebûye.

Ew nîşan û nîgarên lu li ser çermê mirov tîn çêkirin, li ba kurdan, sûryanîyan û farisan wekî “deq”, li ewropîyan “tattoo”, li nav ereban “wesm(newş)” û li tirkên jî wekî “dövmê” tê binavkirin. Di çandên cihêreng

de, wateyên cihêreng bi boyaxên xurt li ser deqan tîne danîn ku li jiyanê jî laş neyên jêbirin.

Deq ji bo erdnîgarîya Mezopotamyayê çi ye?

Herçiqas ku Îslama sunnî destûra deqên mayinde nede jî, xemilandina laşên bi deqan di nav Mezopotamyayê de berbelav e. Deq ji bo erdnîgarîya Mezopotamyayê wekî kevneşopî tê dîtîn û tê texmînkirin ku ji demên berî Îslamê mane û heta îro hatiye parastin û hê jî li hin devarên Mezopotamyayê berdewam dike. Kurd û hemû gelên din yên ku li erdnîgarîya Mezopotamyayê dijîn, deqê hem wekî hêz û tenduristî û hem jî wekî aîdiyet bikar tînin. Deq ji bo wan dîrok û bawerîyên wan nîşan dide.

Li gorî hin ramangêran jî, deq ne tenê xemilandin û motîvên ku li ser bedenên mirovan tîn nexşandin in, her weha hemû



Sultan Ağırbaş-Akbîna
Ji gundê Celika-Kirkpînarê
Foto: Arşîva Hasan Ağırbaş

kevneşopî û felsefeya binyatê ya ku di giyanê de hatiye nivîsandin e. Yanî bedenîbûna çandê ye. Deq li gorî bawerîya her çand û herêmê hatine çêkirin. Wate û armancên deqan cûr bû cûr in.

Mînak: Hêvî, tenduristî, bereket, bawerî, bext, hêz, tilsim, çavînî, efsûn, îşaretên sterîn, estetîk û xweşîkbûn, sembolîzma olî, nasname, girêdana qebîle û eşîran û hwd.

Deq çîng (çawa) çê dibe?

Taybetmendiyên ku deqê ji tat-tooyan vediqetîne ew e ku deq li hin herêman bi şîrê dayikek nû keçek anî dinyayê û teniyê tê çêkirin. Li gorî bawerîyê, zayîna dayikê bi vî rengî derbasî keçikê dibe û ev wekî celebek bereketê tê qebûlîkirin. Sedema din jî ew e ku şîrê kêça nû ji dayîk bûyî, ji şîrê kurik kêmrûntir e . Ji bo ku



deq baş bigire, divê şîr kêmrûn be. Piştî ku şîr tê temînkirin, ew bi tenîya potê ku jin li ser agir çêdikin, ya binê pacê an jî ji lambê û çirê tê tevlihevkirin. Û ev materyal, li ser laş bi figurên ku mirov bixwaze, di binê çerm de yekoyek bi lêdana derziyê tê nexşandin.

Deqên ku bi pêvajoyek bi êş li ser laş tê xêz kirin, ji bo ku îltîhab nebe divê neyê şilkirin. Deq di deh rojan de sax dibe û rengê kesk yê deqê êdî ji bedenê heta mirinê nayê jêbirin. Jinên elewî û êzidî jî dibêjin: “Em wan gîyayên yekem ên salê tev li şîr û tenîyê dikan ku ma deq baş bigire û rengê wê xweşiktir bibe”. Li hen deveran jî şûna şîr “marara” ku ji zefrana dewar, pez û bizinan tê girtin bi tenîyê

ve tevlihev dikan û pê deqan çêdikin (niştecihîn li sînore bakûr û rojava-ya Kurdistanê û kurdên Anatoliya Navîn). Deq bi gelemperî li bihar û payîzan tên çêkirin. Li go-

ra ku ew dizanin, di wan mehan de xwîna însan hîn zêde diherike û deq hîn baştir digirin. Deq bi piranî ji aliyê qereç û mitirban ve bi peran tên çêkirin. Jina ku deq çêkiriye jê ra dibêjin, “Dekkake”, ji kesê ku deq dike ra “Medkuke” tê gotin. Mêrê ku deq çêkiriye jê ra dibêjin, “Dekkak”, ji kesê deq dike ra “Medkuk” tê gotin.

Deq li ser laşê mêran zêdetir li ser laşê jinan tê dîtin. Bi pirranî li ser çengê, enî, gep, lêv, mil, dest, ling, tilî, zend, stû, sîng û memikan, li dora çavan û hwd tê neqîşandin.

Deq ji bo jinan çi ye?

Deq ji bo jinan azadî, xemilandin, xweşikbûn, bextewarî, coş, zayokî, êş, wêrekî, qêrîn, çîrok, helbest, car car tîpa yekem ya sernavê dildarê xwe, car car jî hêvî ye. Jinekê digot: “Dema ez keçik bûm, min deqek li ser destê xwe da çêkirin, da ku ma hewî neyê ser min, paşê ez bi xwe çûm ser hewîyê.” Car car jî dibe kilameke dilşahiye. Jin ji bo ku deqan çêbikin, tên ba hev, kilaman distrên û bi şahîyê yek bi yek deqan li ser laşên hevdu xêz dikin.

Deq ji bo mêran çi ye?

Deq ji bo mêran xwebawerî ye, berhemdarî ye, qehremanî ye, şanazî ye, hêz e, delalîyê malbat û civakê ye, wek nîşana cûdabûnê ye, nasname ye, girêdana êl û eşîrê ye, sembolîzma olî ye û hwd.

Fîgurên deqan wek: Xezal, çav, xaç, roj, stêrk, hîv, çûk, kerguh, dar, heywan, kulîlk, dupîşk, şeh, şahmaran, bazin, xirxal, şikla “^” û hwd.

Wateya wan hemûyan pir neyê zanîn jî, li gorî bawerîya her çand û herêma tê guhartin.

Çend mînak:

Kerguh: Zayokî ye.

Şahmaran: Tendirustî, şîfa, temendirêjî, bereket û berxwedan e. Li ser zendên destên mêran berhemdêrîyê temsîl dike. Jin jî li ser zenda pê çêdikin.

Dupîşk: Qehremanî û şanazî ye.

Roj: Ronahî ye.

Stêrk: Ji bo enerjîya erîni ye.

Hîv: Li gor hen herêman jî heger li ser serçavên jinekê şiklê hîvê hebe, ew tê wateya ku ew ji êzdiyatîyê derbasî misilmanîyê bûye. Yê keçikan jî ji bo ku wek ronîya hîvê xweşik bin ew çêdikin.

Lêv û çene, qelb: Ji bo hezkirina mêrên wan jinan ji wan re zêde bibe û zimanşîrîniya wan nîşan dike.

Çav: Bo nezerê ye.

Kulîlk: Bila hemû bêhna xweş a xwezayê û bedewîya wê derbasî jinê bibe û jinan xweşik bike.

Xaç: Ji xerabîyê diparêze û ji bo Sûryanîyan ew nîşan dide ku ew kes çûye Qudus ziyaret kiriye û hecî ye.

Xezal: Bextewarî, bext û narîni ye.

Şeh: Wekî sembola bedewîya jinê ye.

Meqes: Bext, bereket e.

Deq li Anatolîya Navîn

Deq li nav kurdên Anatolîya Navîn jî belav e û wekî li Kurdistanê mîna kevneşopîyekê tê dîtîn.

Ew kevneşopî jî, wekî yê din bi xwe ra anîne û li wan deran bi sed salan berdewam kirine. Deq li ba wan jî heta 50-60 salî berê dihat çêkirin. Wan “marara” yanê zafrana dewar, pez û bizinan tevli tenîyê dikirin û laşê hevdu yekoyek bi derzîyê lê didan û neqîş dikirin. Car car jî ew materyal, ji boyaxçiyên tayên rîs (yê rîs den dikir) yê dihatin gundan, ya hazir çêkirî jê distandin û pê çêdikirin. Keçik û jin dihatin ba hev bi şahîyê hem kilam distran hem jî hevdu yek bi yek deq dikirin. Pîrîka min jî deqên xwe hebûn. Min rojekê meraq kir û pîrsî ka kengî, çing û çima wan deq çêkire. Wê ji min ra got: “*Me êdî hay ji xwe hebû (me nû dest bi kemalîyê kiribû). Rojekê birayê min hat, di dest de derzî û tişteki reş mîna merhemê hebû. Wî got: ‘Hûn î mezin bûne û wexta we ya deqan hatiye.’ Ji bo ku em xweşik bibin û ma bizanin ku em êdî mezin bûne. Em çend xwang, me li ser*

enî û destên xwe yek bi yek bi deq nexşandin.” Deq nîşana mezinbûnê bû. Gaveke ber bi ciwanîyê ye. Xemilandinek bû, ya ku ew keçikên ciwan bedew dike û ber bi jiyanê ve dimeşîne û dibe.

Li Anatolîya Navîn mêran jî deqên xwe hebûn, lê ew pir kêmbûn. Tek tûk dihat dîtîn. Wan jî bi pîranî wekî li Kurdistanê ji bo nasname, nîşana êl û eşîrên xwe çêdikirin. Ew ji bo ku dema herin derekê an jî eskerîyê, ger tişteki bi wan hat, birîndar bûn an jî wenda bûn, bila bizanibin ew kî ne û wan li xwedîyên wan vegeirînin. Car car jî ji bo delalî û cûdabûna wan nîşan bide dihat çêkirin.

Neqşandina deqan hîn jî li hinêk devarên Mêrdînê, Qerejdaxê û herêmên din ên Kurdistanê berdewam dike, populerbûna kevneşopîya deqên berê di nav nîfşên kurdan yê nû de pir kêmbûye. Lêbelê deqên nûjen (tattoo) zêdetir dibin. Ew sembolên kurdbûn û olên xwe bi tattoyan li ser laşên xwe didin nexşandin. Her çend cûda be jî, ji bo wan dibe sembola rêzgiriya çanda wan.

Xerîbî

Tinebûna te ye
Dûrî ye
Li kuçe û kolanan
Wek pelên dara payîzê
Berba bûne
Bêkesî
Bêwarî
Xem barîne
Şevên tarî û xemgîn
Reşka çavên te de
Dilop dilop
Wek baranên biharê barîne
Bêheval û
Bêhogir
Li warên nenas
Tenêbûn e.
Tinebûn e
Dil parî parî
Kovan barîye
Ya herî giran
Bêwelatî û
Penaberî ye



Mem Xelîkan

KILAMÊN ME (VIII)

Mem Xelîka



MALA BAVÊ MÎN BIRANO

Wek her alîyekî Tîrkîyê kurdên Anatolîya Navîn jî, ji ber debara dinê, ji ber tineyîyê, ji bo herin kar bikin, salên 1960-65an berê xwe dane xerîbîyê, çûne welatên

Ewropayê. Ne yê hesan bû. Wan salana tineyî hebû. Debara dinê î bi qar bû. Pêşeroja wana neyî eşkere bû. Piranîya wanan nezan bûn. Ji xeyrî eskerîyê, hê ji gundên xwe derneketi bûn. Ew rêyên dûr, welatên nenas, ji wanan re şeverêş bûn. Çûyîn hebû lê wegerîn heye tine, kesî nedizani.

Mala xizanî û tineyîyê bişewite. Ya meri ya bere ber her derîyekî. Wanên ji ber tineyîyê

ketin rê, her tiştek dane ber çavan, malbatên xwe, kal û pîr, dê û bav, zar û zêçên xwe, bûkên dest bi hinne dûw xwe ve ci hiştin, cih û warên xwe, welatên xwe dûw xwe ci hiştin, berê xwe dane welatên xerîb û bûn koçber.

Xana Meçê, ji gundê Kûtiga ye. Gund girêdayîyê Cîhanbeylîya Konyayê ye. Ji wê koçê Xanê jî para xwe girtîye. Çar birayên Xanê jî, dê û bavên xwe, xanimên xwe û kurikên xwe, birayên wana yî salbiçûk Memikê û Xanê paş xwe ve ci dihêlin berê xwe didin wê rêya dûr û dirêj, diherin welatekî ku hetanî wê rokê ku nav nebihîstine û ji wan ve nenas,

dibin koçberên Danimarkayê.
Xana Meçê, jineke biheş û aqil-
mend bû. Gund bi jinan mayîbû.
Qar û barê malbatan,

ketibû stûyê jinan. Her karekî
malê, xwedîkirin, mezinkirina za-
rokan û xwendina wanan barekî
giran bû li ser milên jinan. Kurik
bêyî bav, jin bêyî mêr û bêyî sitar
mayîbûn.

Bi ser çûyîna Ewrûpayê ve sê
çar sal derbas dibin. Ne xet ne
xeber. Mîna huro tilefon û name
tinene. Ji yê çûyîn Ewrûpayê
demeke dirêj kes ti xebera nagire.
Nav gund da jî şor û gilî zêde di-
bin. Herkesek şorekê dike. Wek
"Yên çûyîn êdî venagerin. Li wir
bi jinên gawir re zewicî ne. Wana
êdî ti xêra xwe bi me nabe."

Xana Meçê, bi ser çûyîna
birayên xwe va tim diçû bavanên
xwe dihat. Li hal xatirê wan
dipirsî. Destê xwe bi ser wanan re
digirt. Karê malbata bavanên xwe
wek mezina malê îdare dikir. Lê
sê çar salan şûva weng şor û gilî
ketin nav gund rokê tere bava-
nan, bûkên bavanên wê ti qedir
û qîmetê nadin Xanê. Mînak
sûcdar ew be.

Ne yê qole(hesan) bû. Hena ji
wanan dergûşên berşîr di hemêzê
de bêbav mayî bûn. Hena hê di
ser bûkbûyîna wanan re şeş meh
derbas nebûne, bi mêrên xwe ve
hevêsa xwe ji hevdu neşikestine,
ji hev bi dûr ketine. Dûrî hebû,
hesretî hebû. Ya herî giran jî
pêşeroja wanan neyê diyar bû.

Xan bi ser wan şor û gilîyên
ketine nav gund û hereketên
bûkên xwe ve vedigere mala xwe
rûdine şîneke xwe dike. Bi kila-
ma li jêr derd û kulên xwe tîne
ziman. Kilama Xanê, li heremê
bû kilama koçberên Ewrûpayê.

MALA BAVÊ MIN BRANO

Keko min nizanî min nizanî
Ber çavê xwe de anî min nizanî
Roka îd û erefa ne
Xwanga kwîr bûyî nizane here
mala kîjanî

Mala bavê min birano
Kula dilê min hemalno
Li Danîmerka şewitî yerli mano
(*Dubare- neqeret*)




Elî Hemo Cemal Keko
Bîra we dikime
Çiyê xwe de rûniştîme
Şîna birayê xwe dikime
Koma xwe bi şîr û şeker mezin dikime
Qurbana we me carekê werin mehlê bigerin
Jina bêtir meri tê nemane

Keko keko ez li çiyakî tu li çiyakî
Du sêv rustin li telakî
Mala bavê min e bi heft bira bûn
Ez î mame bi Memikê bi birakî

Ha li gozê ha li gozê
Dilê min î dengkirina birayê min dixwaze
Ew misilman naçûn nav gawira
Ê ji bîrkirine nimê û abdasê

Keko keko sibê ji mala xwe derketim
Kurikê we hatin bi dora min ketin
Metê xwe bi qurban be
Min çavê xwe lê gerandin
Ez bûm mîna tevna ji girê de ketim





Dilê min î dîn e dilê min î dîn e
Germekê li qolince min daye çinge bi tîn e
Berf baranekê li min daye şingeşing e
Memikê biçûk bûye esker nizane talima ling e

Çiyayê Danimarkê bişewitin reş e girin
Texsîyê wan hemalna di ber ra radibirin
Çavê min tine li perê gawira merk û krona
Terime fabriqê serê pêçîya gî komir e

Keko keko çûm mala we bi mîvanî
Ji çar bûka yekê nego zeyê rûne li vî kulavî
Hatî ye wexta ziyan û zevîya
Xwanga kwîr bî şaş e here ser
zevîya kîjanî

Çavkanî: Serbülent K

Quto

Qatkim
tilsimê xwe
birêjê

baran barî
gorên min şil bûn
heta sibê ê ziwa bin

min deng bihist
çav
nedîn

şevên dirêj
xewnên tarî
sibê ye

ve ba
ji bo te ye
bi hemdi xwe bihn ke

berfê
kuçik û
zarok xenê kirin

saet
berî min
hate mal

hivronî ye
çîk eyaz e
darên rût

ronahîya şevê tarî
dengên bêşop
rêvitiya kur

Qerfo

Stîleke nu ye. Bêhed, bêsansur û otosansur e. Rexne û henek in.
Bêtirs in, lê zik û hîsên kesî naêşînin. Çav û mêjo vekirî ye.

xizanîyê
bi gotinan dixemilînine
serpas raketin

li ber dikanê berber
li ser kursîyê reş
berberê por gij

kîtêbên berg sor
navarok kesk
asumanê tarî

gurê hevdûne
qurşina bêdeng
û bêşop

rîsipî sîwane wî digirê
destên siyasetmedar
di berîka wî da

Gotinên pêşîyan

Gotinên pêşîyan formeke mesajên hijarte yê gelerî ne ku di nav axavtinê de bi rengê rêzimanî ya neguherbar hatine gotin. Gotinên pêşîyan diyardeyeke kevn a avrasyayî û afrîkayî ne û di destpêka çandên nivîskariyê yê kevn de tên dîtîn ku di nav sumeran de jî hene. Gotinên pêşîyan fêrbûnên ji zanistiyên kevneşopiyê di mesajên xwe der vedihewînin!



Ji zana bipirse ji nezana bitirse!
 Bi şîrî bigrê heta pîrî
 Qantir çiqasa bi biha ne tim dule kera ne.
 Çiya ji ser çiya rabin xuyê merîya ranabin!
 Merîyî nezan newêreka camêr dike
 Merê paşîyê kuçikê çarsîyê
 Yê pêşî bext e yî paşî text e
 Li ser dengiz geriya şimik şil nekiriye
 Derda ji derd vêketîya pirske
 Bûka metê kera qametê
 Buka xalê delala malê
 Hespî çê qamcîyê di xwe nagîne
 Şev yek e diz hezar e
 Ecer hatin kevin xelat in
 Hur bajo kur bajo ga mêşîne
 Berxê çê li ber kozê belîye
 Îşkirê xwe şîrînê xelkê ye
 Xelk nêynika merîya ye
 Tirî yê li tirî mêzke reş be
 Mîya topala ku heft kerîya li hev qelivandine
 Bûkê ziman tune xwasiyê îman tune!
 Bûka li ser hespê kes nizane qismata kê!
 Ku sirtî kerê xurîya a here nanî şivên bixwe
 Naxtare çucikê mede dest ruvî,
 Navî giran e mezeli wêran e!
 Mêr ji zavacê şûnda jin zaroka şûnda
 Çavên li derîya xalî vi serîya
 Westîya kir vesîya xwar
 Malê ne ji yî çê ra ne jî ji yî xeraw ra!
 (Yê çê yê bi xwe bike yî xerab jî yê te kirî jî xirab bike.)
 Yê ku bi ar ara xwe parast ê biar got ji min ditirse
 Ji baranê şûnda ga cilmeke!

Berhevkar: **Altun Başaran**

Janêşên bêdeng

ez

nexşa temenekî talanbûyî me
keftarên demê
li ser erdnîgariya xaka mesûm
cirîdan diavêjin
sînorên bedena westiyayî
xwîn vedirişin
salan kirasê xeman li rojên şad
pêçan
berbangên rûken bi axîn û nalînan
avis bûye
heyva nîvbiriqî
di îskeîska gewriya xwe de
fetisî
rengê kulîlkên baxê hezkirinê
çilmisî
zimanê pênuşê
di keserên helbesta birînkûr de
lal bû
kaniya hevokan li ser kaxizan
miçiqî
qayika xweşgotinan
serûbin bû
keskesora hinav xatir ji min xwast
li xweşsohbata şevên şên
çîrokên dapîra min
sêwî man
pelên dara hêviyê
li ber bayê zaliman
berba bûn
felekê toza bagerê li ser xeyalên rût
dawêşand
kabusên xewnan
hevalcêwiyê bêxewiya
şevên min in
janêşên bêdeng dilop dilop





li ser zeviya giyanê xapînok
dibarin
bextewarî
di qêrîna rondikên çavên reşbelek de
xeniqî
çirûskên agirê eşqa dilê sermest
vemirîn
sebir
li kolanên xeribîstana xopan
tarûmar bû
perdeya hestên jar û neçar
veçirî
zexelên demê
kêf û sefaya seyrangehan
ji min dizîn
konê kul û kederên xedar
di paşila şevên melûl de
vegirtin
çûkên qefesa qelişî
ber bi warên nediyar ve
fîrar kirin
kezeb û cîger li min peritîn
bêtalîha jiyanê bi sikura min ve
hatiye zeliqîn
her şev û roj
bêhna mrineke bêwext
ji henesa min ya tengbûyî
difûre

Xizan Şîlan

Hîkayeke bi almanî

Li hêla pirê



Heinrich Böll

Wergera ji almanî: Nuh Ateş

Wan pîlên min kêlkiribûn û karek ji dabûn min yê ku min dikanîbû bi rûniştandî bikira: Ezî merivên ku di ser pira nû ra derbas dibin behêmjirime. Ew pê şadibûn ku jêhatîbûna xwe bi hêjmaran ispat bikin, ew sermest dibûn bi vî netutiştî yê bê mene ji xêyrî çend hêjmaran. Bitûnî rojê, bitûnî rojê devê min yê bédeng wekî çerxbûna saetê ya ku ez pê hêjmarê didim ser hêjmarê da ku êvarê serfiraziya hêjmarekê dîyarî wan bikim. Rûyên wan dê bibiriqe gava ku ez encama dora xwe ji wan ra bibêjim. Hêjmar çiqas bilind be

rûyê wan wê ewqas zêde bibiriqe û va ji wan ra dibe sebeb ku ew bidilrehetî bikevin nav nivînan, ji ber ku bi hezaran kes di ser pira wan ra derbas dibin...Lêbelem statîstika wan ne durist e. Bibor in, lêbelê ew ne durist e. Ez merivekî ne bawerdar im, herçiqas ez vê fehm dikim ku ez întibayeke durist cihdihîlim. Bi dizikî ez şadibim ku min carna yek ditepisand. Paşê ku ez pê diêşîyam min dîsa çendek dîyarî wan dikirin. Şabûna wan di dest min da bû. Gava ku ez hêrs dibûm, gava ku tiştê min yê ji bo kişandinê nedibû, min tenê

kêmûzêdeyek heldida, carina di jêr kêmûzêdeyê ra. Û gava ku dilê min dikute û ez şad dibim hîngê ez dihêlim ku comerdîya min bi hêjmareke ji pênc xalan biheriqe.

Erê ew weqas behtîyar in! Wan her carê resmen netice ji dest min radikişandin û çavên wan dibiriqîyan û dest li milê min dixistin. Wan qet şik nedibirin! Û paşê wan dest pê cemandinê, dabêşkirine û bisedîkirinê dikirin, nizanîm hîn çî. Wan hesab dikir ku îro her deqeyê çiqas di ser pirê ra derbas dibin û di dehsalan da çiqasê di ser pirê ra derbas bibin. Ew ji pêşeroja duyem hez dikin, pêşeroja duyem taybetkarê wan e, lêbelê bibor in, evana gîşt ne rast in...

Gava hezkirîya min ya piçûk di ser pirê ra dihê - ew rojê du caran dihê- hîngê dilê min jixweberê dadiweste. Kutinîya dilê min ya bêwestiya jixweberê bi dawî dibê, hetanî ku ew çerxe rêya fereh dibû û xwîya nedibû. Hemû yên ku di vê demê da derbas dibûn, ez ji wan ra nabêjim. Ew du deqîqeyan yên min in, tenê yên min û ez nahêlim ku wan ji dest xwe berdim. Û her weha, wexta ku ew êvarê ji salona bestanîyê

şûnda vedigerî jî, devê min yê bédeng yê ku bihêjmire mecbûr bû bihêjmire, hîngê dilê min ew dîsa disekinand û min dîsa dest bi hêjmartinê dikir, hetanî ku ew ji ber çavan wenda dibû. Hemû kesan, yên ku bi talîh bûn di vê deqîqeyê da di ber çavên min yên kwîr ra dibihurîn, nedikanîn ji bo hemdemîyê bikevin nava jimarê: Wekî sîmêr û sîjin, jindarên tûne ewê nikanibin di pêşeroja duyem ya jimarê da tevbimeşin...

Ev zelal e, ez ji wê hez dikim. Lê haya wê ji vê qet nîne û ez jî naxwazim ku haya wê ji vê hebe. Gerek e şiknebe ku ew bi awayekî çiqas ecayîp hemû hesapkirinan diavêje ser lodê û bêhay û bêşûc gerek ew bi porê xwe yê qehweyî û lingên nazik bimeşîya salona bestanîyê û gerek e ew pir bexşîs werbigre. Ez ji wê pir hez dikim. Alemeşkere ye ku ez ji wê hez dikime.

Demekê di ber vê wan ez kontrol kirim. Ji ber ku hevalê ku li hêla dîn rûniştibû û tomefil bihêjmartina ez wextîna hayadar kiribûm, lewma min pir zêde diqet dikir. Min mîna ku ez dîn bibûm dihêjmart, hejmar-toka kîlometer nedikanî baştir

bihêjmarta.
 Berpirsyarê
 mezin yê
 hêjmartinê
 bi xwe li
 hêla din
 xwe danabû
 û paşê wî
 encama
 saetekê bi ya
 saetpilanê
 min va qiyas
 dikir. Yên

min yek ji yên wî kêmtir bû.

Dilketiya min ya kin hatibû
 cem min û di jîyana xwe da ezê
 qet tu caran nahêlim ku va zaro-
 ka bedew di dahatûya duyem ra
 bihê derbas kirin. Ev dilketîya
 min ya piçûk gerek e ku neye
 carkirin, dabeşkirin û nebe pro-
 senteka tune. Dilê min xwîn
 dibû ji ber ku ez mecbûr bûm
 ku min bihêjmarta bêtî ku min
 bikanîya lê binihêriyama û ez pir
 minetdarê hevkarê xwe yê li hêla
 din bûm yê ku mecbûr tomefil
 bihejmartina. Bêşik ji bo min
 meseleya man û nemanê bû.

Serokê hêjmartkaran dest
 li milê min xist û got ku ez baş
 im, sadiq û bawerdar im. „Di



saetekê da yek
 şaş hejmartiye“
 wî got, „ne pir
 e.“ Jixwe em

jibo kevnbûyîne parekê jê kêmtir di-
 kin. Ezê serî lêbidim ji bo ku hun
 bibin berpirsê arebeyên hespan.
 Arebayên hespan helbet bahane
 ye. Ewê mîna nûvayîyek bêemsal
 e.


Arebeya hespa ya şahane bibe.
 Di navberê saet çaran û heyştan
 da îcaze tune ku arebeyên hespa
 di ser pirê ra derbas bibin. Hîngê,
 ezê bikanim herim bigerim, yan
 herim salona bestaniyê têr li
 êvîndara xwe ya piçûk binihêrim,
 yan li ser rêya mal gavekê bibim
 refeqetdarê wê, hezkirîya min ya
 piçûk ya ku nehatiye hêjmartin...

Helbest



şewka şevê tarî
bêdengî û du diliya bi tenê bûnê
şev bi min mina leylanêkê dihat
tijî surr, dizî, ramantik û xeyal
mîstîsme şevê dibû bingehê xem û heyalan, biranînan, ramanan
û meraqa zanatîyê hulqkirina dînê û jîyanê.
darê zerdala yê bi tenê yê di herimê mektebê da
bi şev dibû kasre heywanan
û bi roj dibû şahida stêrken çavên zarokan
ezmanî ji min dûr
li enexterekê ku hemî deriyên şevê û kâinatê veke digerîyam
mîrov şevê bi pênc hîsên xwe dijî ew jî têr nekin
revitîyeka dest pêbike, ez î li ku derê me, ez kî me,
ji ku da tême û kuda terime
min dixwest ku bi şevê, bi dînê û bi asûman re bi yêk bim
min hembezkin, min bi ser singên xwe din û bi min re surrên xwe
û zanatîyên kûr û dirêj perwa kin
min çiqas dixwest ku bi xwedîyê bersivên pirsên bêpaş bim
min dixwest ku azad bibim
kainatê ez destboş bi çolê xistim

Sefî Doğan



Ji çepê da: Mile Zexe, Xelê Kutu, Êse Ele

Kurteserpêhatî -2

Xelê Kuto

Îhsan Turkmen

Merivekî bifikirin ku di dinê da tişteki wî tune be. Ne dê, ne bav, ne xwang û bira. Ne mal-milk, ne kinc-kol, ne meras û ne jî gore - tişteki xwe tunebû. Ne wî tişteki dabû vê dinê, ne jî ji dinê tişteki hêvî dikir. Pismamên wî hebûn, lê ne ew li wan xwedî derdiket û ewqasî tê bîra min, ne jî ew li wî. Lêxwedîderketin hesteke ku ji Xelê ra ne ayan bû. Di gundekî wê demê heftsed malî da tenê du kes li wî xwedî derdiketin: Usê Ele û Gencê Malê Bêre. Van herdu xêrxwazan serê wî dişûşt, serî û rûyê wî kur dikirin. Di jîyana wî da ne "ez", ne jî "ya min" hebû. Bi tena serê xwe bû. Ji hemû barên dinyayê azad, nîvtazî yekcarra jî bi kurtazî digerrî. Bejna wî kin, porê wî kurkirî û hertim serqot bû. Porê wî sipî, rû û simêlên wî yê hertim kurt, reş, bedena wî bi pirç bû. Yekî ku Xel nasnekiriba û di qunc yan jî di kendalekî da rastî wî bihata, dilê wî ê biqetîya.

Navê dînbûyîne li ser bû. Lê Xel ne î dîn bû. Xel tenê mezin nebûbû. Hertim mîna zarokekî biçûk mabû. Merivekî ji jîyanê bê bendewariyên mezin bû. Birçî

dibû nan dixwar, tî dibû av vedixwar, diwestîya, li kuderê bibûya xwe diavête erdê, bêhna xwe digirt. Tişteki bixwasta û nikaribûya bi dest xista wernî bi ser diket, xwestina wî nebûya, xwe diavête erdê. Hê jî gundî ji bo zarokên xwe diavêjin erdê û digirîn ra dibêjin "Tu çi bûyî Xelê Kuto".

Kêfê wî li şûnê bûya, yek carra henekên xwe jî bi xelkê dikir. Keçek yan jî lawek bidîta, digot: Lawo, tu lawikê min î. Yan jî keçe tu keçika min î û gava bersîv bi dilê wî bûya, devê wî yê gir heta heyî vedibû û dikire hîkehîk dikenîya. Yekcarra jî gundîya henekên xwe bi Xelê dikirin. Gava yekî ji Xelê bipirsîya, bigota "Xelê saet çend in?", Xelê hema pêşê saqoyê xwe vedikir, yan jî fîstanê xwe radikir, dezgehê xwe dida nimandin û gundî têra xwe dikenîyan.¹ (*)

Xelê tenê xûyekî wî yê neçe hebû: Heyfhildan! Ji bo Xelê heyfhildan hesteke bingeîn a prîmîtîv bû. Heyfhildan ji bo wî karekî bêrawestî bû. Kê li Xelê xirabîyek bikira, ew azar bikira, li wî xista, Xelê ew kes li ber çavên xwe reş dikir û heta ji destê wî di-

¹ Di kitêba xwe ya bi navê *Tayek por*, di beşa "*Rojek ji jîyana dinê gund*" da birêz Nuh Ateş, bi navê "Kino" qala Xelê Kuto û hinek taybetiyên wî yên ku jî min va nenas in, kirîye.

hat, zîrar dida wî kesî. Na, li kesî nedixist. Kîngê di ber mala kesê ku jê zîrar dîtî ra derbas bibûya, camên wê malê kevir dikir û heta ku dilê xwe rehet nekiriba jî, dev jê bernedida. Gundîyan ew xuyê wî baş dizanîn. Ji ber wê jî ewqasî ku ji destê wan dihat, ji Xelê ra baş û bi midare bûn.

Xelê di gund da tenê nanê sê çar malan dixwar û hewnîya xwe bi çend kesan dianî. Ne hevaltî, ne merivtî, ne jî dilûxatir dizanî. Kesekî ku di her aliyê jîyanê de bi serê xwe bû. Da ku mirovekî bêheval, bêdost û bêmehbet bû. Taybetîya wî ya herî mezin tazîgerîn û kevirkirina wî ya caman bû. Sîfetê wî tê bîra min, lê yekûyek serpehatîyên min bi wî ra nebûn. Hê jî gundî qala wî dikin, kêmserpêhatîyên xwe bi Xelê ra kat dikin. Lê ligel jîyan û kiryarên wî, herî pir qala wê şeva kembax, a ku bûbû sebebê mirina Xelê dikirin.

Sal 1978, ji rojan dehê çileyê bû. Ez zarokekî pênc salî me. Di şeveke zivistanê a sar da, bi carekê ra bû hewlîya cîranan. Bi şev nivê şevê min jî mîna herkesî xwe avêt derva. Kadîna cîranê me, ya Mala Eçelî agir pêketi bû. Pêtên agirê gur bi metreyan di ser xanîyan ra xûya

dikirin. Ji ber ku agirê kayê şên e, tu yê bêjî qey volkanek teqîya û di ser xanîyan ra li ser gund pêtên xwe dirijand. Di nava niv saetê da dor kadîne bûbû cîhê mehşerê - kesek di mal da nemabû - kal û pîr, keç û bûk, zar û zêç, hemû gund li wir civîya bû. Ewqasî ku pê dizanim, ew cara yekê bû ku li gund xanîyek dişewitî. Ji ber emrê min ê biçûk, her ez berê di berde neçûbûm jî, sedema lihevciwîna ewqas mirovan ne tenê agirpêktina kadîne bû. Milet ji bo Xelê Kuto hatibû. Kesî baş nedizanî, lê ihtîmal bû ku Xel di kadîne da bûya, ji ber ku ew carcaran di wê kadîne da radiket.

Wê şevê heta sibê kes raneket. Devdeve sibê gundîyan agir vemirandin. Kadîna qaraortu, şewitî û helşîya bû. Ji ber ku derîyê kadîne jî helşîya bû, çend kes di teqa kadîne ra ketin hundir û bîstekê bi şûnve bi meyîtê Xelê va derketin derva. Xel bi hewlîyekê anîn dane ser cîlekê. Hewlî dîsa bi ser gundîyan ket. Lê ne kesî şînek kir, ne jî kesî li ser wî sitira. Tenê axûwaxa millet bû, çend jinên temenmezin jî li junîyên xwe dixistin. Mêran her wekî di rojê weng da, bi aramî ji nav millet vekîştin û meyîtê Xelê hewş kirin.

Xel fetisî, rewisî, yan şewitî bû, nizanim, nayê bîra min. Ya ku ji me va eyan bû, şewata kadînê û bedena Xelê ku can jê vekîşîya bû. Bê ku tenê kevirekî li du xwe bihêle, bê xatirxwestin, bi mirineke trajîk Xel çûbû. Bi gotina Mistefê, ku ji dûrê da merîyê Xelê jî tê, Xel telef bûbû. Ji wê rojê çend wêne û ev gotina Mistefê di bîra min da mane.

Mistefa ji bo karkirinê çûbû Almanyayê û piştî çend sala li wir bi şa nekir, vegeîya bû gund. Mistefayê ku li gund haya wî jî dîn tunebû, li Almanyayê vegeîyabû ser dînê xwe û dest bi nimê kiribû. Xûya bû ku li Almanyayê ne tenê nimê, lê çend gotinên din yê ku ji gundîyan va nenas bûn jî hewisî bûn. Mistefê li kuderê du kes bidîta, dest bi waazê dikir: "Ji heywanan ra nebêjin mirîye, guneh e - heywan mirar dibin. Bi nîngê çepê nekevin mizgeftê, şeytan wê bi we ra têkeve hundir. Nimîya sibê çar rekate in - dudu rekate in ferz, dudu jî sunet in." Hema kî bidîta ev gotinên xwe dubare dikir. Wê şevê, bi carekê ra gotina "telef"ê jî devî Mistefê derketibû. Gotina Mistefê ne ji alîyê kesekî ve hate pêjirandin û ne jî kesekî li dijî wê tiştek got. Ji

ber ku kes tenegehîştibû ka wateya wê çi ye. Telef, di wî emrê min da, him ji bo min, him jî yên din peyveke nû bû. Gotina Mistefê bi halî di nav millet da hatibû qebûlkin. Li kuderê qala meselê bihata kirin, peyva "telef"ê derbas dibû: "Xelê fiqare telef bû", "Ha, mala minê, çîng telef bû û çû". Gundî weng tenegehîştibûn bû ku gava kesek bişewite, yan jî di nav dumên da bifetise, ew telef dibe. Xel jî telef bûbû - mîna berxeka bi lehîyê da çûyî, mîna çûçikeka bi derd ketî.

Piştî salan min hewisî ku gotina "telef" ji bo mirina heywanan tê bi kar anîn. Xel hate bîra min, Mistefa hate bîra min. Mistefê çima ew gotina bi kar anîbû? Gelo li ber çavên wî, Xel heywan bû? Mistefê ya ji nezantîya xwe ev gotina kiribû, yan jî ew li Almanyayê di nav civata ku ew tê da bû, fêrî vê gotinê bûbû. Îro, piştî çel salan ne mimkun e ku ez jî vê pirsîyarê ra bersivêkê ji devê Mistefê peyda bikim. Lê dîsa jî xwaska min wê şevê Mistefa nedîtaba, ew gotina wî nebihîstiba, yan jî kadîn neşewtîya, bişewtîya ba jî Xel ne tê da ba.

Xelê Kutu, tazî hati bû vê dinê û tazî jiya û tazî jî xatir ji wê xwest.

Bi kurdîya şêxbezenî helbestek hêja

MIN KURDÊ ANADOL ÎM

Dengdikem je heymene'w hoze
Dîqîrînim je qonya û qule
Quwwet dîrim je canbeg'e
Mîn kurd'ê anadolî'm

Je Aqsaray-Ortakoy'ım
Je çeltîge û je yunax'ım
Le polatlî'm le ênqera'm
Mîn kurd'ê anadolî'm

Je bala'm le golbaşî'm
Je qoçhîsar hend gûlam
Je çiçekdax je qaman'ım
Mîn kurd'ê anadolî'm

Le sêwas le her şunım
Le qeyserî le çanqırî'm
Le toqat-zîle û erba'm
Mîn kurd'ê anadolî'm

Le çorım le Yozgat'ım
Je Amasya-Merzîfon'ım
Le sînop-boyabat'ım
Mîn kurd'ê anadolî'm

Le duzce û qerebuk'ım
Le samsun Bafra-havza'm
Le saqarya-aqyazî'm
Mîn kurd'ê anadolî'm

Dengım nîyay je nazîllî
Surgunum le tekîrdağî
Le stembol le bursaî
Mîn kurd'ê anadolî'm

Zwanıman je vîr nekîrdîn
Orf û édet mêg nekîrdîn
We qebîle û we eşîret'ın
Mîn kurd'ê anadolî'm

Çen set sale dur magım
Je îwegel û je welatem
Jî hesrete bîrîndarım
Mîn kurd'ê anadolî'm

Derd û dılım bîr-ı xwîne
Wîgım wek CEGERXWÎN'e
Wîzanın ay halê îme
Mîn kurd'ê anadolî'm

Xelîl dîşî je naw dîlo
Tım dînalım wek bîlbîlo
Kes nêzanî halê mîno
Mîn kurd'ê anadolî'm

Haymanalî Aydınoglu
Xelîl Şêxbızınî

HELBEST

duh xewn bû
demek bû û li ber çavên me helîya
hafize me biranîne cîvan berhevkin

îro jîyana rast e
roj û qederê xwe xûliqandin
di dest me da ye

li ser rê gelek astengî hene
ruh û can wek bîrayên dijminin
berxedan û rev ê mimkûne

sibê utopîyayê
leylanên li doralîye me da revitîyê bikin
mirov dikane kur anjî rûbarî dinê temaşa bike
hevîyên rojên û şevên bixemilînin

li kevîyên çemen qamîşên qulên li zirafî bukê xin
hespên simên peşîyê ji zer û yên paşîyê ji ziv
ê erebê bûkê bikşînin

Seyfi Doğan

Dengê bavê min-III

Hayrettîn Güven

Bavê min, Mihemmedê Seîd, xizan bû, sewî bû ji ber ku bavê xwe zû mirî bû. Xwendin û nivisandin nedizani.

Lê tim digot: "Min nexwend, hûn bixwînin kurrê min. Merîyên ku nexwendî kûr in."

Kurrikên xwe gîştik bi xwendin da. Ez bûm bijîşk û lekolîner li ser kanserê. Xûşk û birayên min jî piraniya wan lîse xilas kirin.

"Baran a Bîradirêj"

Salên min belkî 14 belkî 15 bûn. Zevîya me li Ketê li Bîradirêj bû. Zevî ecer derketî bû û xeber hat ku digotin:

"Mihemmed, ê tewênê (dibên) şivanê zevî diçerîne".

Bavê min bi lêz û bez rabû û ji dîya min re got:

"Moke, hamma ji ma ra çolarûneke bi dew va çêke, ez î herîme ser tarle. Ê tewênê şivonê tarlo diçerîne. Mogone şarafsiz, ne fedî dikine, ne hayo dikine."



Bavê min got: "Xoyratîno, tu jî vi min ra worî?"

Wext wexta dora êvarê bû. Ewîran sor dikir. Melê dest li gûh bû bo limîya êvarê. Bavê min saet ne dizani bû ji ber we jî me wext gora wexta limî hesab dikir.

Min got: "Erê ezê warim wolla bobo, wono çimo tarlê me diçerîne?"

Em nezîkî zevîyê bûn melêye mehla jêrî ya Bîradirêj dest bi azanê kir.

Bavê min: "Aptaza te heye Xoyratîno?"

Min got: "Erê"

Bavê min: "Tamom ê rindê emê li keleka zevî nimê bikinî"

Min wê caxê fêrî nekîrî bû lê bavê min ji nûşkava deng hilda û got:

"Lo û loooo, lo û looooo"

Şivanekî bersiv da:

“Erêêêê, erêêêê”

Min got: “Bobo tu çimo bang-dikî weng?”

Bavê min: ”Lokî min mo bizanin em ê hatinî ser terlê. Ew indin ji me nawerin werin va derena”

Ez serblind bûm min digot şivanên bi kûçikên bi xeleqê jî ji min ditirsene.

Me li kelekê zevî limi kir. Bavê min dîsa bi şaşitî nimê dikir. Min ta wê wextê fêm kir kû Xûdê li nîyeta mirov mêze dike ne ew rindîyan çawa dikin. Ji ber bavê min bawerîya min a bi ola Îslamê nerim bû.

Piştî nimê me nanê xwe derxist û bi dêw ve xwar. Qey te digot min goştê berxan dixwar. Ha wîqes xweş bû tahma vî nanî li çolê.

Saetêk carekê digot: “*Lo û loo*”

Her carê yek yan jî dû û se şivanan digot “Çî lo çîîî”

Piştî bîskeke me nimêya yasîya jî kir. Hewa sar bû û me xwe li kend-alekî dirêj kir.

Bavê min dest bi bêtan (*îlahîyan*) kir. *Hesbî rebbî* digot, *Veysel Qaranî* digot. Şev rêş bû min ne dîdit kû ew bi bêtan digirî an na.

Ez bi bêtan ketim hewê.

Piştî 5-6 saetan bavê min got: ”Xoyratîn rawe rawe baranê diware, te niha nexweş biwî. Rawe em herinî yaylê.”

Min got: “Em ê herin mala kê vê çaxê?”

Bavê min: “Em ê herinî camîyê rakevin heta nimêya siwê. Te vi dolmişan re herî gund, ez ê roka din li vir bimê.”

Her der tarî bû ku çav çavan nedîdit. Dengê kûçikan dihat. Bavê min zanî ku ez tirsîyam, got: ”Metirse, kûçik nê me, em ê di herdî malê Ûskê re herinî, kûçkê wana tûnnene.

Derîyê mizgeftê jev bû û em ketin mizgeftê. Ez hema raketim. Pê saetêk duduyan bavê min ez rakirim û got: ”Rawe abtazke, xocê hat.”

Piştî nimê siwê got: ”Here li dolmişe kêne û ku perê xwestin bê bobuy min ê poşîngê bide”

Ez li dolmişê niştim, şûfarê dolmişê opkî ????? got: ”Tu lokê kê yî?”

Min got: ”Ez lokê Mihemmedî Seîd im. Ez î herima gund.”

Opkî ?????: “Ko perê te hene”

Min got: “No opo”

Min xwe amedê kirî bû ku bêjim “Bobî minê so bi te de apo” lê apê ????? got “Perê te tunne xarase cika din li dolmişê mene.” û tê re kir û vi rê ket.

Salên min niha 47 in. Kengî li dolmişêke sûwar bibim apê ????? tê bîra min: “Perê te tunneye xarasê cika din li dolmişê mene.”

Gelo bo yekmîn car navê Kurdistan di çi demê da peyda dibe?

Ehmed Mîlan

Piranîya dewletên mehelî yên kurdan serkot dibin li ber êrêş û tecavûzên turkimenên Selcûqî.

Selcûqî ku bi eslê xwe da ji rojhilata Çînê hatine û qewmekî şerkir û xûnrêj bûne, lewra bi êrişan xaka Îranê "kurd û pars" û Eraq dagîr kirin û bi zora xûnrêjîyê zeft dikin û dewletek pir bi hêz li ser axa welatên dagîrkirî wek Îran yanî pars û kurdan û ereban saz dikin. Him fars û him jî ereb teslîmî selcûqîyan dibin, lêbelê kurd li ber disekinin û tên kuştin lê serê xwe ji selcûqîyan ra xwar nakin.

Alguhertinek pir mezin li ser axa kurdan ku zeft û dagîr kiribûn dixebitînin. Lewra dabeşî û teqşîmata siyasî û administrasyon li ser xaka dîrokî ya Kurdistana rengîn û giranbiha bi kar dînin. Dabeşîya îdarî û teqşîma coxrafî ku navê Kurdistan bo yekemîncar li ser nexşa rojavayê Asiya peyda dibit, bi arşîtektîya selcûqîyan.

Di dawîya qurna duwanzdehan da, Sultan Sencerê selcûqî beşa rojava ya Zagrosê, nêzikî Kirmanşanê bi şiklê herêmeke cihê û cewaz ku navê Kurdistan lê dike û hetta birazîyê xwe yê bi navê Soleymanşah dike berpirs û şahê Kurdistanê, Kurdistaneke xiyalî û çûçanok ji kurdan ra dikişînin.

Di qurna çardan da, Hemdolah Mistofi jî di kitaba xwe da bi navê *Nozhetilqlûb* bo yekimîncar Kurdistanê bi nav dike, loma ji vir û weha navê Kurdistan di eserên dîrokî da tên nivîsandin û îstifadekirin. Hidûd û sînurê Kurdistana Selcûqîyan wakîne bû:

Li alîyê rojhilat Mada Merkezî yan navendî¹ bû ku ereban Navê Eraqa Ecem li ser danîbûn, li alîyê Bakûr Atropatkan yan Meda piçûk² ku diguherin bi Navê Azeraycan.

¹ Êkbatan paytexta madan bû û navê wê jî guhertin û kirin Hemedan.

² Atropatkan, Azerbaygan yanî Ateşkeda herî mezin a zerdeştîyan li vira bû, atro yanî azer yanî agir.

Li alîyê rojava Mezopatamya ye ku ereba pê re "Eraqa Ereb" digotin. Li alîyê başûr Xuzistan bû. Ev Herêma ji şanzdeh navçe û nahîyan saz dibûn, lewra heya li gor berhermên iqtisadî û abûrî jî bi hevdu ra ferq dikirin lêbelê ji alîyê nijad, dîrok û ferhengî ve kurd bûn.

Hemdolah Mistofî li ser nijad, hest û huvîyeta wana tişteki nanivîse. Li ser kurdan wê waxtê dinivîsîne ku kurdan bi turkemenan ra şer dikirin. Ev ne ji ber ku Kurdistanek xwe çêkiribûn, belkî li Selmasê jî ku nêzî Kela Xoyê û Wanê ye, kurd wek hergav bi turkan ra dicengin.

Di dema Êlxanîyanên Moxol de, ew Kurdistana ku Selcûqîyan bokurdan saz kiribûn, daha çûktir dikin ku merkeza Kurdistana Moxola dibe Sultan Abada, Çemçal û Kirmanşanê jî kurdan ra zêdetir dibînin û ji Kurdistanê cihê dikin.

Balkêş e, ew Kurdistana ku Selcûqî arşitektê siyasî û dabeşên mehindsî bûn, heya îro jî bi navê Kurdistan yadîgar maye. Senen-dec an Sine Merkeza Kurdistanê

ye, loma ne Kirmanşan û ne jî Hemedan ku pir nêzîkî Sineyê ye, Kurdistan nayên hijmartin.

Selcûqîyan li gor peywenda xwe ya siyasî hidûd û merzên teze li wîlayetên: Atropatkan û Aran û Anatolî kişandin ku berî êrêşa Selcûqîyan yek vahid û yek parçe bûn, bi mehendsî dabeş kirin. Axa berfireh û mezin a kurdan ku heman wîlayetên Aran³, Anatolî, Mezopatamya, Atropatkan û bi elaveyê seranserî zincîra çiyayên Zagrosê bûn, bi fesadî û hîleû bi navê dabeşkirina îdarî feqet yek hedef dixebitand ku kurdan di çarçûva wan sînor û merzan da bihêlin. Loma dixwestin mafên wan yên dîrokî û ramanî û ferhengî pamal bikin, bipelçiqînin û bêhêz bikin.

Herodot dîrokwanê mezin yê yûnanî li ser ejdadên kurdan dinivîse, ew şûnên ku kurd tê da dijyan wakîne bûn:

"Matrenoi (Media)" û "Saspes (Atropatkan)" û "Alarodîoi (Orarto yan Ararat- Agirî).

Piştî mirina Aleksandirê Makedonî, Atropatkan bi destê serokê qebîla Meda rizgar dibit.

3 Aran yan Eran bi farsî ku navê orjînalên: Azerbaycana Sovyêt, Ermenistan, Gurcistan û zincîra çiyayên qeqazê li ser wan herêman e.


Atropatkan ji herimên din yê Media cihê dibe loma bi tenê û bi serê xwe îstîqlalê peyda dike. Pîranîyakurdan wê demê li Aranê, Anatolî, Mezopatamyaya û serhed û zozanên "zincîra Çiyayên Zagrosên" dijiyan.

Di dewrana hikûmdariya sasanîyan da konfedrasyona qebîlên kurdan di Atropatkanê da dijiyan.

Herêm û eyaleta Atropatkan dibe xwedanê coxrafya û erdnigarîyeke taybet ku merz û sînûrê wê bi qirarê jêrê eşkeredibe: Ji aliyê bakûr va çemê Erezê, ji aliyê rojhilat va nahîya Moxanê û çiyayên Gîlanê û çemê Sipî ye û ji aliyê başûr va paytexta Meda yanî Hemedana îro yan Meda mezin ya merkezî qirar girtiye.

Di wê demê da bajarê Gahzap-Şîzîgan paytexta Atropatkanê bûyî. Wê dewranê da "Wîlayeta Mah" bi unvana hesta merkezîya axa Meda dihat hijmartin ku girêdayî qewmên Lor e.

Minteqên rojavayê axa kurdan



yanî bakûrê Mezopatamyayê ku di nav da bajarên: Amed (Dîyar Bekir), Nosebîn û Şîngal ji hebû, bi şiklên minteqên merzî bûn di navbera Sasanîyan û dewletên Rom û Bîzansî de.

*Nexşa
Kurdistanê ji
dema kewn da*

Şapûr padişahê Sasanî, hindek qebîlên ereb koç û mihacirî bakurê Mesopatamyayê dike ku ew der axa kurdan bû. Ew erebana jî hinek nav û nîşanên wîlayetên kurdan diguherin, wek ji wîlayeta Mah re

"Cibal" yanî çiya dibêjin. Navên wîlayetên Meda merkezî û Mezopotamyayê diguherin wek "Eraqa Ecem" û "Eraqa Erebi".

Paşî serkotbûna hikûmetên ereb, îran li ber pêlê êrêşîna turkmenên Selcûqî alguhertinek mezin jî li serê kurdan tê: Navçeyek çûçîk ji Meda mezin bi navê

Kurdistan peyda dibe. Ev cure alguhertinên coxrafi ku di ax û xaka kurdan da rû daye bê îtbar û merdûde (nayê qebulkirin) bo xatirê ku kurdan tê da şirket nekirinin. Li gorqanûnê jî merdûde çimkî merzên coxrafi nîştimanên kurd pir mezin û berfire ye wek "Anatolî, Aran, Mezopatamî, Atropatkan û hemû "zincîra çiyayê zagrosê" gerek tê da heba û biba.

Pêwîst e zane û azadîxwazên kurd û bi taybet partî û hêzên siyasî yên kurdan baş têbigihêjin ku ev têza teqşîmat û dabeşkirinê, têza rêjîma Selcûqîyan bûye, loma li aliyên kurdan nehatî pesendkirin. Lewra heke hêzên siyasî şaşitîyê bike û vê têza Selcûqîyan pesend bike, xiyanetek mezin bi tevger û azadîya Kurdistana mezin ra kiriye. Loma berî êrişa Selcûqî û Moxolan li ser kurdan ku kurd yek parçe û yek vahid bûnin, wek: Atropatkan, Aran, Mezopatamya, Anatolî û rişte zincîra çiyayên Zagrosê. Êrêşên Selcûqî û Moxolan bi îranê re ku merzên coxrafi û erdnîgarîya di navbera kurdan re bi mohendisî dikişîne lêbelê cenga Çaldiranê vê xerîtê bê îtbar dike.

Cenga Çaldiranê ku di navbera rejîma Sefevî û Osmanyan


de ji destpêka qurna şanzdehan de rû dide, bi xwe dibe şehedê belengazîya zêdetir. Ev cenga ne tenê dibe sedema alguhertinek tehl di jiyana komeletî, îctimaî û siyasî ya kurdan de, belkî hidûdên dabeşkirina coxrafiya siyasî xaka kurdan jî dixê bin kontrola neyar û dijminên kurdan. Ev alguher-tina, demografi û asîmlasyona kurdan ji qurna 19an da dibe sebeba qutbûna îrtibat û peyvendiya xelk û camîa kurdan.

Sînûr û merz benda coxrafiya kurdan ji qurna şanzde heya dawîya cenga cihanê ya yekem dimeşe, loma dabeşbûna kurdan bi qudreta xwe da dimîne lêbelam rejîmên zor telebên turknijad wek Sefevîyan, Qecer û Osmanîyan li sehna siyaseta cihanê verşikest dibin, lewra ew sînûr û hidûdên ku wana kişandibûn muteber namînin.

Lewra bandora cenga Çaldiranê kontrola nîvê axa Kurdistanê dixê bin destê Osmanîyan.

Loma ji prosa qurna şanzdehan heya hijdehan xaka giranbiha Kurdistan bi wesîla rejîmên talankerên Sefevî û Osmanî dest bidest digere û serûbin dibe.

Çavkanî: dîroka Tevera kurdan
nivîskar: M. Kardûx



Yek ji me

Amed Tîgrîs bîranînên xwe nivîsî. Weşanxaneya APECê jî çap kir. Hewldanên ku li Amedê jî çap bibe dest pê kirine.

Bîranînên min a Amed Tîgrîs rê xweştir dike ku gelek bîranînên din lê bibin. Çaxa xwendevan vê berhemê bixwîne, çêtir e ku defter û pênûsa wî li ber wî be, lewra mirov dikeve nav miştaxa hemwateyan Mamostê me serpêhatiyên xwe bi devoka Licê lêkiriye. Teştî tiriye şîre xweş difûre.

Nivîskarê me li goma Xicîkan ya li taxa qerehesena Licê, li mala xwe ya li Varberg a Stockholmê û li şaneşîna xwe ya li Seyrantepeya Amedê rûniştiye û bi me re ketiye nav sohbetê sade û geş, carna jê belkî gotin hinekî dirêj jî be, lê bîranîn in.

Balkêş e, di bîranîn Amed Tîgrîs yên li Kurdistanê ji giraniya sosyo-politik diyar e lê her ku bîranîn me bi xwe re dibê welatên Ewropayê bîranîn regekî postmodernî distîne.

Amed Tîgrîs têra xwe rê daye erdheja Licê ya sala 1975'an, dekûdolabên dewleta tirk û hewldanên kesayetî û rêxistinên şoreşgeran. Amed Tîgrîs erdhejek din jî kat dike. "erdheja" polîtîk ya nîfşên salên 60/70'yan. Erdheja piştî Kenan Evren ya sala 1980'yî ku artêşa tirk desthilatdarî girt dest û krîza wan hîn jî didome. Li wir em dibin şahidê trajediyên sosyal û şikestinê. Wa xuya ye Amed Tîgrîs bi vegotina vê erdhejê re barekî giran ji ser milê xwe daniye. Li gor nivîskar, belkî qapaxa beroşê girtiye lê ji bo me xwendevanan nivîskar qapaxa beroşê ji ser rakiriye.

Amed Tîgrîs di vê berhema xwe de cîhek berfireh daye sistemên perwerdeyê yên ji hev cuda. Yek jê perwerdeya hiyerarşîk û yan din jî demokratîk. Xwendevan sistema perwerdeya hiyerarşîk yê li Tirkîyeyê dinasê, îtaat û ezber. Rê û mecalên ku şagirt bikaribin bandorê li ser perwerdeyê bikin ne diyar in. Zor û zahmetî şagirtan diwestînin. Li Swêdê ne wisa ye. Li dibistanan zikê şagirtan têr e. Tevgerên gelîrî zora perwerdeya kadetrâlî ya berê birine. Cîh û rola şagirtan ku bikaribin gotin û


ramanên xwe pêşkeş bikin, zelal in.

Ji xwe Amed Tîgrîs metod û pedagojîyên herdu sisteman jî ji nêz ve nas dike. "Bîranînên min" a mamostê me Amed Tîgrîs hêjayî xwendin û şîrovekirinê ye.

Amed Tîgrîs di pêşgotina berhema xwe de dibêje: "Di nav civaka me kurdan de nivîsandina bîranînan nebûye kevneşopîyeke çandî û dîrokî. Nivîsîna bîranînan gelek giring e. Mirov bi jiyana xwe re, jiyana civaka serdema xwe jî radixe ber çav, ew dibe kurte dîrok, mîraseke mayînde û li pey mirov dimîne. Nivîsandina di nav nîfşê kevn û nû de dibe weke pireyeke çandî û dîrokî."

Ma ne ji xwe! Aliyeke din yê bîranînan jî heye; tu dizanî dîroka kurdan bêtir alim û oldarên resmî li gor berjewendiyên desthilatdar û kolonyalîstan nivîsîne, nerast û tevlihev e. Îca kurd çiqasî serpêhatî û bîranînên xwe binivîsin wê hewqasî bi ser rastî û rêya xwe ve bin. Bîranînên min ya Amed Tîgrîs, yek ji van berhemên e. Dor dora te ye!

Seyîdxan Anter



Ebdulkerîm Kerkûklîzade

xwedîyê îmtiyaz û rêvebirê kovara «Rojî Kurd»

Cutyar T. Hawrami

Di sala 1912an de komek ji rewşenbîr û têkoşerên kurd ên ciwan, ku bi pi piştgirîya hin rewşenbîrên kurd ên naskirî ve li Stenbolê bi navê “Komela Hêvî Xendekarên Kurd” “Kurd Talebe Hêvî Cemiyetî” ava kirin.

Damezirînerên komê ji bo ku xwe ji tundî û îqgefên rejîma Îttîhat û Terakkî biparêzin ji destpêkê ve biryar dan ku rûyê xwendekar û çandî zêdetir bidin komê û ji duruşm û mijarên siyasî yên gel dûr bikevin. Ji navê komê heta bername û na-

veroka weşanan, bi rengekî ku bêtir rû û reftarê komeke xwendekarên nîşan bide, nîşanî hev dan, ne komeke siyasî. Lê belê ji gef û zordariya rejîma Îttîhat û Terakkîyê rizgar nebûn. Gelek ji wan ketin girtîgehê, bingeh û baregehên wan hatin qedexekirin û sansureke giran li kovar, rojname û weşanên wan hate kirin. Lê ev ciwan û xortên bi hêz û xweragir, bi rêberatiya kurdan bi ezmûnên xwe yên bihêz û tecrube, ji bo derbaskirina astengî û gefan gav avêtin û çalakîyên


xwe domandin. Di encamê de şovenîzm û dîktatorîya rejîma Îttîhat û Teraqî gihîşt welat û hemû xebatên çandî û civakî ji kurdan re qedexa kirin.

Yek ji berhemên herî hêja yê “Komela Hêvî Xendekarên Kurd” jî weşandina kovara *Rojî Kurd* bû, rojnameya *Yekbûn*, kovara *Hetawî Kurd* û çend belavok bûn.

Hejmara yekem a kovara *Rojî Kurd* di 19/6/1913an de û hejmara 4an jî di 14/9/1913an de derket. Xwedîyê kovarê **Ebdulkerîm Kerkuklîzade** xwedîyê kovarê bû ku navê wî bi awayî hatiye nivîsandin: “Xwedî îmtiyaz û midûrê mesûl: Ebdulkerîm”. Lê di kovarê de di dawîya gotarê de navê wî wekî **Silêmanê Ebdulkerîm** hatiye nivîsandin.

Silêmanê Ebdulkerîm anku Ebdulkerîm Silêmanî kî bû?

Di vê nivîsê de ez ê biyografiyeke kurt binivîsim û li ser hin nivîs û nivîsên wî bisekinim. Navê wî kesayetîyê bi gelek awayan hatiye nivîsandin û gotin: “Ebdulkerîm”, “Silêmani Ebdulkerîm”, “Ebdulkerîm Efendi”, Ebdulkerîm Kerkuklîzade, Kerkuklîzade Ebdulkerîm, Kerîm Begî Hacî



Ebdulla, Kerîmî Hacî Ewla, Kerîmî Hacî Ewlay Heme Kerkukî, Kerîm Begî hakimî munferîd, Kerîm Begî Kerkuklîzade.

Min di vê gotara xwe de Ebdulkerîm Kerkuklîzade nivîsandîye.

Ebdilkerîm kurê Hecî Ebdullah e û ji malbata Kerkuklîzade ye. Di sala 1888an de li Silêmanîyê ji dayik bûye. Qonaxên xwendinê li Silêmanî û Kerkûkê qedandiye. Di sala 1908an de ji bo dirêjkirina xwendina xwe bi birayê xwe yê mezin (Hacî Mela Se'îd Kerkuklîzade) re çû Stenbolê. Li wir hiqûq xwend.

Di sala 1912an de xwendina xwe temam kiriye. Sala ku li Stenbolê jiyaye û li koleja hiqûqê xwendîye, bûye dost û hevrêyê gelek kesayetî û ciwanên çalak



yên kurdan. Li gel gusar û zor-darî ya rejîma Îttîhat û Terakkî ji alîyên kurd civîn li dardixistin û nîqaş dikirin û nêrînên xwe vediguher-tin. Di encamê de “Komela Hêvî Xendekarên Kurd” “Kurd Talebe Hêvî Cemiyetî” ava kirin.

“Komela Hêvî Xendekarên Kurd” a herî çalak û naskirî ji kurdên parçeyên cuda yên Kurdistanê pêk dihat, wek: Memduh Selim Beg, Qedri Cemil Paşa, Ekrem Cemil Paşa, Abdul-Ezîz Babanzade, Kemal Fewzî, Necmedîn Husên Ker-kukî, Mihemed Salih Bedirxan, Fikrî Necdet Diyarbekrî, Fuad Temo, Xelîl Xeyalî, Şefîq Erwasî, Hemze Muksî, Ebdulkerîm Ker-kuklîzade û hin kesên din.

Koma Xwendekarên Kurd li ba-jar û bajarokên Kurdistanê belav bûye û bûye organîzasyoneke mezin û berfireh. Ji xeynî xe-batên rêxistinî, kovara *Roja Kurd*, rojnameya *Yakbûn*, kovara *Ha-tawiyê Kurd* û hin weşanên din hatin weşandin.

Ebdulkerîm Kerkûklîzade ku parêzer bû, ji ber dilsozî û jêhatîbûna xwe bûye sernivîskar û rêveberê *Roja Kurd* û di hej-maran de çend gotar bi kurdî weşand. Nivîsên wî xwedî nave-rokeke perwerdeyî û teşwîqkirina xwendin û rêzgirtin û qebûlkirina hev in. Di axaftinên xwe de is-rar kir ku divê zarokên kurd bi kurdî biaxivin û bixwînin. Bang li mamoste û rewşenbîrên kurd dike ku bala xwe bidin zanistê û zanistê bidin zarokên kurd û dev ji bîr û bawerîyên kevn û kevnepî berdin. Ebdulkerîm Kerkûklîzade ligel zimanê kurdî, zimanê tirkî, erebî, farsî û fransî dizanibû, lêbelê ji bo ya girîng nivîsandina kurdî bû. Rejîma Îttîhat û Terakkî ku xe-bat û çalakîyên “Komela Hêvî Xendekarên Kurd” bi berdewamî şopandine, naveroka gotar, hel-best û babetên kovara *Roja Kurdî*

wek metirsîyek li ser ewlehî û yekrêziya dewleta Osmanî şîrove kiriye û di encamê de Ebdulkerîm Kerkûklîzade û hin endamê navdar û naskirî yên komelê hatin girtin û ketin girtîgehê û hatine îşkencekirin.

Memdûh Selîm Begê Wanî (1892-1976) di gotareke xwe da ku di kovara *Dîyarîyî Kurdistan* de ye û sala 1925an li Bexdayê derketiye, nivîsiye (sala 1913) midûrê kovarê *Rojî Kurd* hate hepiskirin û çend mehan ew eşkence kirin. (Dîyarîyî Kurdistan, hejmar 7, 18/06/1925, r 43).

Kurdên Stenbolê bi taybetî hin malbatên Baban ku di hukûmetên Îttîhat û Terakkîyê de cîh girtibûn ji piştî gelek hewildanan Ebdulkerîm Kerkûklîzade û hevalên wî ji zîndanê derxistin û hatin azadkirin. Piştî serbestberdanê vegeŕiya Silêmanîyê.

Di tîrmeha 1914an de li dadgeha Silêmanîyê hate istihdamkirin. Refîq Hilmî di bîranînên xwe de nivîsandiye dema ku wî lîse di sala 1914an de qedandiye û xwestîye ji bo xwendinê biçe Stenbolê, Kerîm Begî Kerkûklîzade (hikumdarê



Munferîdê) jî nû ji Stenbolê vegeŕiyabû. Kerîm Beg ji bo Necmedîn Hisên (birayê Ebdulxaliq Esîrî) kaxezek nivîsand daku Refîq Hilmî li Stenbolê hêsan bike û bawerî bi wî û endamên din ên “Komela Hêvî Xendekarên Kurd” bîne. Piştî Refîq Hilmî dema ku hat Stenbolê nêzî koma xwendekarên kurd dibe û hin erk ji bo wan bi veşartî kir. Ev jî isbata wê yekê ye ku Ebdulkerîm Kerkûklîzade peywendîyeke berdewam bi wê komê û endamên wê re hebûye.

Refîq Hilmî di beşekî dinê bîranînên xwe de weha nivîsandiye, ku ew û Ebdulkerîm Kerkûklîzade û çend kurdên din yên naskirî yên li Baxdadê (li Ta-

pa kurdî) ji bo armanceka siyasî li mala Mustefa Begî qayimeqam kom bûn.

Ebdulkerîm Kerkûklîzade di sala 1922an de li dadgeha Kerkûkê kar kiriye. Di 28/5/1923an de wek cîgirê serokê dadgeha Bida'a ya Kerkûkê hat erkdarkirin. Ew nêzikî salekê di wê postê de maye. Ji 1/3/1924an û pê ve bû hikumdarê Munferîdê. Pişt re ji dadgeha Kerkûkê bo dadgeha Silêmanî hat veguhastin. Ji 25/5/1927an ve bûye dadwerê Munferîd li dadgeha Silêmanîyê. Pişt re li wê dadgehê bû dadger.

Li gorî şahidên kesên ku wî ji nêz ve nas dikin, ew di karê xwe de gelek, durist, rastbêj û bi disiplîn bû. Kerîm Begê dadwerê Munferîdê di hinek hejmarên rojnameyên *Jîyan* û *Jîyanewe* de nivîsandiye û ji bo kar û barên dadgeha Silêmanîyê ber bi Bexda, Kerkûk, Helebçe û deverên din ve çûye. Di rojnameyê de pesna rol û karen wî hatiye kirin. Di van salên dawî de hin belgeyên Dadgeha Silêmanîyê (1925-1928) hatin bidestxistin ku girêdayî hin pirsgrîkên civakî û milkî ne. Di belgenamayan de dadwerê munferîdê

Silêmanîyê Ebdulkerîm hin ji wan nivîsandiye û îmze kiriye.

Di wê heyamê de rojên xwe yên betlaneyê bi Şêx Nûrî Şêx Salih (1896-1958), Mele Mehmûdê muftî- Bêxûd (1881-1955) û hin helbestvan û rewşenbîran re derbas kiriye. Di sala 1928an de nexweş ketiye. Ji bo dermankirinê çend caran birine Bexdayê. Hinek caran baş bûye û dîsa nexweş ketiye. Di rojnameya *Jîyan* (hejmar 105, pêncşem 8/3/1928) de nûçeya nexweşîya Ebdulkerîm Kerkûklîzade hatiye belavkirin û hêvîya çakbûnê jê hatiye xwestin.

Roja çarşembîyê 18/9/1929an de li bajarê Silêmanîyê koça dawî kiriye û bi beşdarîya hejmareke zêde ya kes û kesayetên navdar ên Silêmanî û bajarên din li girê Seywan hatiye veşartin.

Di rojnameya *Jîyanê* de (hejmar 199, pêncşem 19/9/1929) nûçeya mirina wî, mîna kesekî binavûdeng hatiye weşandin.

Di rojnameya *Jîyan* (hejmar 200, pêncşembê 26/9/1929) Ehmed Axayê Kerkûklîzade bi germî sipasîya hemû kes û alîyan kir ku beşdarî di merasîma cenazeya Kerîm Begî birayê wî de kirin.

Mele Mehmûd Muftî (Bêxûd) nişka ve jiyana xwe ji dest da û ku dost û rêhevalê nêz yê dilê xwe bi helbestekê anî ziman. Ebdulkerîm Kerkûklîzade bû, ji Ev çend ayetên helbesta wî ne:

Estêreyekî burcî hiquqî hebû weten

Emşew le pîr kîşa û be carê kujayewe

Dax û xemî fîraqî ke dana le ser ceger

Zamî hezar saleyî dil wa kujayewe

Girya weten, wutî cigerî min birayewe

Nurî çiray meclîsî xîret kujayewe

Ey çerxî bed mu'amele, takey xeta dekey

Em kurde bêkesane bexem aşna dekey

Ebdulkerîm ke diwênê le ser textî înfîrad

Hakim bû, emro mesnedî darî fena dekey

Ronîkirin:

- * Di hin pirtûk û gotaran de Ebdilkerîm Mehmûd (Şalom) wek “Xwedî îmtiyaz û midûrê mesul”a kovara „Rojî Kurd“ hatiye nasandin. Rastî Ebdilkerîm Mehmûd (Şalom) hîç pêwendî bi kovara „Rojî Kurd“re nebûye.
- * Ebdulkerîm Mehmûd (Şalom) di sala 1885an de li Silêmanîyê hatiye dinê. Di artêşa Osmanîyan de efser (zabit) bûye. Paşê ji Tirkiyeyê derketîye û tevlî artêşa Iraqê bûye û li wir wek efser erkdar bûye. Kesayetekî rewşenbîr û têkoşer ku di nava hin kom û rêxistinên kurdan de xwedî rol bûye. Yek ji damezrînerên koma Xoybûnê bûye. Di 27/12/1961an de li Silêmanîyê koçî dawî kir.

Gotar û nivîsên Ebdulkerîm Kerkûklîzade yê di kovara «Rojî Kurd» û «Hetawî Kurd» de:

- * Tal û Şêrîn, Rojî Kurd, hejmar 1, 19/6/1913, L19-21.
- * Çima zarok zû hînî xwendinê nabin? Rojî Kurd, hejmar 1, 19/6/1913, L21-23.
- * Be tesîrî muhîti madî û me'newî 'ilm û fen, Rojî Kurd, hejmar 1, 19/6/1913, L23-24.
- * Her min bim û kesî tir nebêt, Rojî Kurd, hejmar 2, 19/7/1913, L21-22.
- * Îbret, Rojî Kurd, hejmar 2, 19/7/1913, L22-23.
- * Befîryakeîn m'awenet, Rojî Kurd, hejmar 3, 14/8/1913, L16-17.
- * Roja Îqbal, Rojî Kurd, hejmar 4, 14/9/1913, L19-21
- * Babanzade Îsmayîl Heqî, Hetawî Kurd, hejmar 3, 11/1/1914, L20

Çavkanî:

- 1- Refîq Hilmî, Bîranîn (Yadaşt), bergî duwem, beşê yekem, Bexda, 1956, L76-77
- 2- Refîq Hilmî, Bîranîn (Yadaşt), bergî pêncem, Bexda, 1957, L91.
- 3- Refîq Hilmî, Bîranîn (Yadaşt), beşî sêyem, amadekirin: Pakîze Refîq Hilmî, Bexda, 1992, L120.
- 4- Zinar Silopî (Kadri Cemil Paşa), Doza Kurdistan, 1969, Beyrût, çapxana Stewr.
- 5- Dîwana Mele Mehmûd Muftî (Bêxûd), amadekirî: Mihemed Mele Kerîm, Bexda, 1970, L96-99
- 6- Malmîsanîj û Mahmud Lewandî, Rojnamegerîya Kurdî li Bakurê Kurdistanê û li Turkîyê 1908-1981, Uppsala, Weşanên Jîna Nu, 1989, L53-57.
- 7- Mihemed Resûl Hawar, Şêx Mehmûd qehreman û dewleta başûrê Kurdistanê, cil 1, London, 1990, L89 û L235-236.
- 8- Mihemed Resul Hawar, Horey Derwêşî yaxî, 1986, Stokholim, Binkey çapemenî Azad.
- 9- Kemal Reuf Mihemed, Ebdulkerîm Silêmanîy Xawendî Rojî Kurd 1913, Kurdistanî Nwê, rojname, Hewlêr, hejmar 1194, 19/1/1996, L6.
- 10- Kemal Reuf Mihemed, Paşkoyêkî nwê bo Ebdulkerîm Silêmanî, Nivar, govar, Silêmanî, hejmar 3, payîzî 1998, L219-221.
- 11- Sidîq Salih, Kerîm Şalûm ... , Nivar, govar, hejmar 3, payîzî 1998, L210-218.
- 12- Sidîq Salih, Bedwadaçûnewey dû wtar Leser Ebdulkerîm Silêmanî, Peyvîn, govar, Silêmanî, hejmar 7, eylûlî 1999.
- 13- Ebdula Zengene, Saxkirdnewey nasnamey xawenî Rojî Kurd 1913, Raman, govar, Hewlêr, hejmar 56, 5/2/2001.
- 14- Ebdulla Zengene, Rojî Kurd 1913, Binkey Jin, Silêmanî, çapemenî Şivan, 2005.

HENEK

Ferîdun

Ramo, Hes û çend kêsên din ji xwe re sohbet dikine. Hesî çexê Ramo dibe; Ramo! bi te li ser dinê fikra terî baş kîjan e? Te nizanê kesek nizana!

– Cima Hesî mino! Li ser dinê bi milyaran însan dijîne. Bes ezî zana me?!

– Na! Na! Tê bizanî!

– Mêzeke Hesol! Însên ne ruh ne jî mêjoyî xwe yî ku ramanan û fêlşefên hemî dinê bizana tune! Lê, li ba me herkes ji bo her fikir û fêlşefên ku li ser dinê hene zana ne! Bi ya min rîya terî baş, insanan hevdu fehî kirine: *Dialog, empatî, mutevazî ya intelektual û empatîya hisî.*

Dilpakî bi hiş dibe! Însan dikarin gelek zor û zehmetan berteraf bikin.

Bi dialogên bi hiş însan ê dewlement û bextîyar bibin, roja helê û dinê bibirqê, şerên werin da-
westandin!

Însan di dû şerbazan, canbazan, derawînan û dizan nemeşin.

Însan nebin murûd, belengaz, xizan, nezan û şerpeze.

Tirsên ku dinê cexa cehenemê dikin ê di bin herde kevin.

– Hesî dîniko! Merî divê xwe nekê hundirê qefesê. Sorên ji her-

fana lê yên li doralîyê tê bibin cembereke ji pola!

Tu ji xwe tenê re nebî qefes! Tê ji heft nîfşên xwe re bibî qefesa ku solixê teng dike!

Bîrmeke!

Doralîyê xwe binêre Haso!

Ka însan cawa bi hevdu re deng dikine! Ka dêûbav dema ku bi hevdu û bi zarokên xwe re dengdikin kîjan pêyvî û gotinan bi kar tinîne!?

Haso qurban!

Xerawîyê ji îstehê xwarin û vexwarinê ne da tê! Xerawîyê ji însaqîya xwe parastinê da tê!

– Zimanî di devî me da yê hêsan terbîyê bibe! Kûda çaxdikî yê êva mêske! Hêşî ku malê min şawitandol!

Guh bi ser serokên dinê de! Bibîhîze! Bibîne! Ka cawa diaxiftine!

Bi gotinên wanan hefterên birçî yê verşên!

– Ma min qet pirsnekire. Min pirsêk pirs kir. Te nutuk avit. Peki em nûha ci bikin?

– Em ci bikinî Haso!? Seri xwe li kevira xini!? Xwelîyê bi serî xwe kinî!?

Herkes here malê xwe û agirekî xwe yî şen dada û xwe germ û ronahî bike!

Erdê pîrozwer

Nivîskar: Pär Lagerkvist

Wergêr: Hesenê Metê

Orjînala kitêbê: *Det heliga landet*, 1964

Dema ku Giovanni pîr û kwîr bû, ew li perava erdekî xalî daxistin. Lewra di keştîyê de ew êdî bi kêrî tişteki nedihat û Tobias ji li gel wî.

Tariyê dest pê kiribû û Tobias î ku tenê wî çav pê ve hebû û didît, li hawurdora xwe mêze kir ka bê avahîyek nîne ew bikanin şeva xwe li wir bibuhurînin. Lê tişteki welê bi ber çavên wî neket. Tiştên di evê çola xirûxalî de dihat fêrqlîkirin, tenê ew bermayîyên kevnesitûnên mezin û jihevketî bûn ku di evê hişkesayîya asîmanê êvarê de xwe didan xuyakirin. Û ew jî nedikanîn bibin sitareya ji seqema şevê û bayê xurt. Lê dema ku wan dît ti rê û rohnîyeke din nîne, rasterast berê xwe dan wir. Destê ew î kwîr di destê hecî

Tobias de û ber bi xirbeyên hilweşîyayî û terikandî ve çûn. Wêrane û xirbeyên li vê perava bêdawî, tenê dirik û tûpekên gîyayên hişk lê bilind bûbûn.

Ew î kwîr pirsî ka ew cihê ku ew wî dibe wir çi avahî ye, lê Tobias nikanîbû pê bide zanîn, lewra avahîyeke welê wî jî ti carî nedîtibû.

Dema ku xwe gîhandin avahîyê êdî tariyê xwe li rûyê erdê baş şidandibû û bi destlepkê di nava sitûnan re, di ser wan kevir û gomîyên hilweşîyayî re bi pêş ve çûn, kevir û gomîyên ku rê kîp kiribûn û ji bo wan dibûn asteng. Di dawîya dawîn de li taldeyê tişteki mîna dîwarekî, wan ji xwe re cîhekî sitareya şevîne dîtîn, bi awayekî pir westiyayî xwe dan erdê û zû ketin xewê.

Sibetirê zû dema ku şiyar bûn, Tobias her li ewî cîhê şevîna xwe bi mereqdarî li hawurdorê mêze kir:

– Ev der ne cîhekî şênîyan e ku lê bimînin, got û ji ew î kwîr re rave kir bê ew çî dibîne.

Û ew î kwîr rabû ser xwe, meşîya û destên xwe î pîr li wan sitûnên mezin û ber bi asîman ve bilind peland û wî bi xwe jî got:

– Na, rast e, ev ne cîhekî welê ye. Diyar e ev der perestgehek e. Lê perestgeheka Xwedayekî welê ye ku ew jî êdî tune ye. Lewra di ser hev de xiliyaye û ti nav û rengê perestgeyekê jî lê nemaye.

Li wir li ser pêyan rawestîya, mîna ku ne yekî kwîr be û hemû xirbe û kavilîya li dor xwe têdigêhîje, li hawurdora xwe mêze kir:

– Ma em bi wexteke ewqas dirêj li rûyê deryayê mane ku ev hemû perestgeh welê bêxwedî û wêran bûne? Û hemû Xweda jî mirine.

Ji nişka ve deng bi Tobias ket:

– Ma te jî bi rastî dixwest tiştêkî welê bibel!... got û ji dengê wî jî diyar bû ku hêrs bûye.

– Belê. Bêguman.

Tobias nexwest li awurê wî

mêze bike, awurê ku bi awayekî vikûvala û bêhêvî berê xwe dabû wî, lê got:

– Dibe ku ev daxwaza te bi cîh hatibe.

Dûre di nav xirbe û wan sitûnên xiliyayî re li evî erdê çol û xirûxalî mêze kir û domand:

– Ez ê biçim hinek ardû berhev bikim ku em ji xwe re agirekî hil bikin, bi berbangê re ev der ê sar bibe.

Diyar bû ku li wextekê ev hawurdora perestgehê bi dar û dahl bûye, belbî jî ji pîrozdarên Xwedê tije bûye. Lewra li hawurdor hîn jî bermayîyên rîçikên daran weke marên lihevgeriyayî di binê tûpekên devî û dirikên hişk de xwe nîşan didan. Wusa diyar bû ev dar û dahl li wextekê bi ber şewatekê ketiye, lewra kok û rîçikên bermayî hîn jî bi reşî û rijikên ji ber şewatekê bûn. Tobias çendek ji wan berhev kir, zêde ne zehmet bû, lê peydakirina dar û hejîkên nîvpûç û nîvhelîsî zehmet bû. Dema ku wî ew ji erdê radikirin, didît ku hundurê wan rîçîk û hejîkan jî mîna axa erdê bi rengekî reş û tarî ye. Wî qevdek pûş û palaxa hişk jî ji xwe re da hev ku bi hêsanî pê êgir dade.

Û dîsa vegeriya perestgehê cem Giovanniye kwîr.

Bayekî xurt her dihat û diborizand, lê di dawîya dawîn de di taldeya dîwêr de agir vêxist. Lê ji ber ku ardûyê wî pir kevin, kufikî û helisî bû, dûyekî zêde ji êgir bilind dibû. Ji ardûyî hinek bi vêketina xwe re tavilê dibû xwelî û welê dima. Û germa xwe jî zêde tunebû. Lê dîsa jî agirek bû ku wan bi awayekî ji xwe re vêxistibûn. Çavên Tobias her li ser êgir bû, ditirsiya ku vemire.

Li wir rûniştibûn, mîna ku lê bihizirin û bibêjin ev kaviil û xirbeyên dîwarên bermayî li wextekê avahiya odeyekê bûne. Xirbeyê ew lê rûniştî, ne li gor mezinîya avahiye bû. Lê dibe ku odeyeke pîrozwer bûye di nava van coterêzên sitûnan de, rêzesitûnên ku ketine û jê pir kêr li ser pêyan mane. Çi bigire dîwarên herçar alîyan di ser hev de ketibûn. Tenê li quncikekî, alîyek li dar mabû û wan jî ew der ji xwe re kiribûn sitareya şevê û agir lê dadabûn. Ew li wir rûniştibûn û dixwestin xwe pê germ bikin.

Piştî demeke kurt li ser bihîstina dengê lingan gelek matmayî

bûn, dengê lingan nêzîk û bilindtir dibû. Welê dixuya ku du kes bûn û bi hev re dipeyivîn jî. Zêde wext neçû di nava blokên ketî re hatin, dûre derbasî hêla sitûnan bûn û li wir bêdeng rawestiyan, tiştek negotin. Xeftanên bi rengê qahweyî û xewirî li wan û di destên wan de jî şiv, weke şivanan.

Baş diyar bû ku şivan in. Lewra tavilê bizinek li pey wan hat, li pêş sekinî û bi mereqdarî li van biyanîyan û agirên wan mêze kir. Herwekî mereqa wan şivanan, bizinê jî bi mereqdarî bi çavên xwe yên zerokî mêze dikir. Şivan bi dudilî nêzîkî Tobias û ew î kwîr bûn û li ber êgir xwe dan erdê. Wan dan zanîn ku wan ji dûr ve dûyê êgir dîtine û gelek mereq kirine. Mereq kirine ka bê meriv li vir dimînin an ne, mereq kirine ka bê ev cîhê bi van sitûnên kevin cîhê mayînê ye an ne.

Bi aramî dipeyivîn û sûretên wan ên jar bi awayekî dostane bûn. Û di awurê wan î hinekî xemgîn de jî ev dostanî hebû. Bizinê dest pê kir û li pûş û palaxa hundurê xirbeyê odeyê çêriya, odeya ku belbî jî li wextekê odeyeke pîrozwer bûye. Bizinê carina serê

xwe radikir û bi awurên xwe yên berê li wan mêze dikir.

Giovanni ji wan pirs kir ka ev avahîya ecêb çi avahî bûye, aya ev der ne perestgehek bûye?

Şivanan pêşîyê li hev mêze kirin û dûre ji wan yekî bersiv da ku ew pê nizanin. Belbî jî perestgehek bûye, lê wan pê nizanîbûne.

Ev sitûnên ha ji berê de her û her li vir, li evî cîhî bûne. Lê çawa û çi bûne, wan pê nizanîbûne.

– Tiştê bala me kişand û bi me ecêb hat ew bû ku vê sibehê ji nişka ve me ferq kir ku li vir meriv hene, agir dadane û di nava van sitûnan de dimînin. Loma em hatin.

Giovanni bersiv da û got:

– Belê, dibe ku ecêb be, lê me cîhekî din nedît, cîhekî ku kes lê dimînin. Ma hûn dizanin bê ev perestgeh ji bo kîjan Xwedayî ava bûye?

– Kîjan Xweda?

Şivanê din jî bi mereqeke zêde:

– Kîjan Xweda? got û berde-wam kir:

– Na, em pê nizanin.

Û hemû bi qasekî bi hev re bêdeng rûniştin.

Dûre ji şivanan yekî dîsa me-

req kir, bi awayekî baldar û bi dudilî pirsî ka ew çawa hatine vir? Ji kuderê hatine?

Û şivanê din lê zêde kir û got:

– Bêguman ku we dil hebe hûn ji me re bibêjin.

Giovanni bersiv da û got ew ji deryayê hatine. Ji nava deryayê.

Li hemberî vê bersivê, şivan gelekî matmayî bûn, lê ev jî ne tiştê ewqas nepayî bû. Û Tobiasê ku tenê wî dikanî evê matmayîna şivanan bibîne, sedema wê tenegehîşt. Loma bi mereq ji wan pirs kir û got:

– Ma berê qet tiştê welê nebûye, qet kesek ji deryayê nehatiye?

– Na, ti carî tiştê welê nebûye.

Piştî gavekê Giovanni ji wan re bahs kir û got:

– Keştîyekê em li vir daxistin.

– Keştîyek?

– Belê, keştî. De qey we jî ji dûr ve carina ew di deryayê de dîtine. Ku heta vir nehatibin jî.

– Na. Qet.

– Tiştê ecêb e.

Tobias xwe bi xwe got:

– Gelek ecêb e.

– Çima we xwest hûn li vir da-kevin?

– Me nexwest. Bêyî daxwaza me welê çêbû.

– A wusa.

Mîna ku têbigêhîjin, herdu şivanan li hev mêze kirin.

– We nedixwest hûn bêne vir. Tiştê ku... em têdigêhîjin.

– Di deryayê de berê we li deverekê, hûn ê biçûyana dereke din, cîhekî din. Û wan hûn li vir daxisitin.

Tobias bi hêrs û narihetî:

– Belê, bêyî xwarin, bêyî tişteki ku em pê bijîn. Tenê kerîyek nan, got û kerîyek nan ji bêrika xwe derxist. Û eva jî, got, min dizî û bi xwe re hanî ku em ji xwe re pê agirekî dadin.

Li ser evê yekê şivanan tavilê devê tûrên xwe yên çermîn ve-
kirin, tûrên ku wan bi ber pišta xeftanê xwe ve kiribûn, ji penîrê bizinan parçeyên mezin derxistin û dirêjî van herdu biyanîyan kirin. Tobias û Giovanniyê kwîr dest bi xwarinê kirin. Baş diyar bû ku wan ji mêj ve ev yeka nekiribûn û ev penîrê ter û şîravî jî li lezeta devê wan dihat. Di destekî wan de nan û di destê din de jî penîr, ji birçibûnê wusa bi xwarinê ketibûn ku wan ji bîr kirin ji bo vê yekê sipasîyekê jî li

şivanan bikin.

Dema wan dixwarin, şivanan jî bi baldarî li wan mêze dikirin, serên xwe ber bi hev ditewandin û bi hev re bi pistepist dipeyivîn.

Piştî ku Tobias hay ji vê yekê bû, mereq kir û gote wan:

– Çi ye?

Wan zû bersiva wî nedan, lê dûre pirsîn ka bê ew dikanin li ewî tiştê ku ew dixwin mêze bikin - ne penîrên wan, lê ew î di destê din de.

Dema wan rahiştin nan, herduyan jî bi hûrgulî lê mêze kirin û dûre bi paş ve dirêjî wî kirin.

– Ma we berê qet tişteki welê nedîtibû?

– Na. Me tişteki welê nîne.

– Lê hûn bi çi dijîn?

– Ê, me şîr heyê û penîr. Û goşt jî bêguman, goştê mîh û bizinan. Lê tişteki mîna evî tiştê ku hûn dixwin, me nîne.

Tobias xwest ku ew ji nêr tahm bikin, lê wan nexwestin, nexwestin tişteki ji van biyanîyan werbigirin.

Piştî ku xwarin qediya, wan dest pê kirin bahsa tiştên din kirin.

– Diyar e ew merivên ku li we welê kirine gelek xirab bûne.

Giovanni got:

– Erê lêê. Belbî jî.

Lê Tobias bi hêrs û bi kîndarî bersiv da ku ew kesên welê bûne, dilxirab û gunehkar bûne, keştîya ku ew lê siwar bûne, rasterast keştîya nebaşîyê bûye, taxima berpîrsên keştîyê jî civateke...

Ji ber vê kîndarîya Tobias, Giovanni milên xwe hilkuta, xwest hêrsa wî daxîne û pê da zanîn ku ew jî weke pîranîya wan bûne. Û li gotinên xwe zêde kir û got:

– Û wekîdin, ma em jî weke wan bûn. Em bi xwe jî ji wê taxima berpîrsên keştîyê bûn.

– Çii? Hûn bi xwe jî ji wan bûn?

Giovanni:

– Erê lêê. Welê bû. Divê meriv welê bibêje, got û berê xwe da Tobias:

– Ma ne divê meriv wusa bibêje? Ma ne rast e?

Tobias bi dengêkî nizim got:

– Belê.

Bi qasî gavekê bêdeng man. Ji şivanan yekî pîrsî û got:

– Ma hûn ê biçûyana kuderê? Bi keştîyeke welê? Bi taximek kesên welê re?

Ji wan kesekî pêşîyê bersiva vê pîrsê neda. Tobias rûniştî û

awurên wî li jêr li erdê. Û ew î kwîr jî berê wî li hêla şivanan û bi çavên xwe ên vala tenê li pêş xwe mêze dikir. Dûre Tobias ji nişka ve:

– Em ê biçûyana Erdê pîrozwer, got, lê bi dengêkî nizim û bêhêvî, mîna ku nexwaze bi lêv bike.

– Erdê pîrozwer?

– Erdê pîrozwer? Ew çi erd e?

Lê wan bersiva vê yekê negirtin. Şivan bi awayekî heweskar car bi car bi vê pîrsê rabûn ku tişteki li ser evî erdî bizanin, erdê ku wan ti carî nebihîstibûn. Lê Tobias ti bersivê neda wan û awurê xwe jî ji erdê bilind nekir. Ew î kwîr jî her rûniştî û bi çavên xwe ên vala li wan mêze dikir.

Şivanan bi pistînî ji hevdu re:

– Erdê pîrozwer, gotin û dûre ew jî bêdeng man.

Baş diyar bû ku wan gelek dixwest li ser evî erdê bi navekî ecêb û nenas tiştina bizanin, lê nebû, ew fêr nebûn. Belbî wan herdu kesên biyanî jî li ser ewî erdî tişteke nedizanîn, lewra ew jî qet neçûbûn wir û wan jî ew der nedîtibûn.

Belbî jî ew erd cîhekî welê bûye ku kesek neçûbûye wir.

Anuha dîsa bi qasî gavekê bêdeng û bêyî gotin rûniştin. Şivan bi şeweya aramî û tehamûla xwe fêr bûbûn ku ew wusa bi hev re rûnin û bêdeng bimînin. Ew bi xwe merivên mezin û gelekî ketibûn, lê bi awayekî salên temenê wan ne diyar bû. Meriv lê nedihizirî, meriv lê nedihizirî û serwext nedibû ka ew dikanin çendsalî bin.

Herweha ji wan yekî berê xwe da Giovanni û gotê:

– Ma tu ne kwîr î?

Giovanni bi hejandina sere xwe pîrsa wî erê kir. Yê din bi mereqdarî jê pîrsî û gotê:

– Tu çawa kwîr bûyî?

Ji dêla ew î kwîr ve Tobias bersiva wî da û gotê:

– Em nizanin. Lê dibe ku yekî tola xwe jê vegirtibe.

– A wusa. Kê?

– Belê, belbî jî Xwedê.

– Xwedê?

– Belê. Lê em tiştekî ji sedî sed li ser vê yekê nizanin.

– Ew î ku te bi nav kir, çima ew bi tolhildaneke welê rabe?

– Ji ber ku vîya kufarî kirîye loma. Lê wek ku min got, em tiştekî zelal û teqez li ser vê yekê nizanin. Dibe ku bi tenê ez tiştekî

welê hîs dikim.

Ji şivanan ew î pêşîn berê xwe da Giovanniyê kwîr û gotê:

– Tu bi xwe çî dibêjî?

– Ew î ku ev bahsa wî dike, ez ji hebûna wî bi guman im. Lê ku ew hebe, ez ê jî ji dil bi van gotinên vîya bawer bikim.

Tobias ji evê bersiva Giovanni narihet bû, belbî jî ew lê dihezirî ku eva kufarî ye. Ê wusa dixuya kêfa şivanan jî ji evan gotinên Giovanniyê kwîr re nehat. Wan baş bala xwe dan ew î kwîr: xet û xalên sûretê wî yê mezin û pîr, bejnûbala wî ya girs û giran. Sîngê wî yê berferreh bi pîrç bû û di nava wê pîrça sipî de tiştekî bi zîncîreke kevin ve hilawêstî bi ber çavên wan ket. Mereq li wan rabû ka ew dikane çî be.

– Ew çî ye wî di ser sîngê xwe de berdaye?

Bi pistînî wan ev yeka ji Tobias pîrsîn, mîna ku nexwazin ew î kwîr bibîhîze. Lê bêguman weke wan gotinên din wî ev jî bihîstin.

Tobias bersiv da û gote wan:

– Ew medalyonek e.

Wusa diyar bû şivan tenegehîştin.

– Medalyonek? Ew çî tişt e?

– Erê, dibe ku bi rastî jî ne

tişteki ewqas girîng be. Lê di-
kane tişteki gelekî giranbuha di
hundurê xwe de bihebîne, tişteki
ku destê meriv jê nabe, nemaze
ji bo kesê ku wê bi hustuyê xwe
ve daliqîne. Loma meriv di ser
sîngê xwe de berdide, li nêzîkê
dilê xwe cîh didiyê û naxwaze jê
dûr bikeve.

– A wusa.

– Baş e, di hundurê wê de çi
heye?

Tobias ji bersivê dereng ket û
sekinî.

– Em têdigêhîjin. Na xwe divê
tişteki vedizî be.

– Belê.

– Ma tu dizanî bê çi di hun-
durê wê de heye? An ew bi tenê
pê dizane bê çi tê de heye?

Tobias bi qasî gavekê bêdeng
ma, dûre got:

– Ew vala ye.

– Vala?

– Belê.

– Vala...

– Ango ti qîmeteke xwe nîne?

– Tiştê ku yê wî ye û ew xwedî
ye, tenê ew e. Û gelek caran jî
min ferq kiriye ku ew ji wendaki-
rina wê ditirse. Ez bawer nakim
ku ew bikane bêyî wê bijî.

– Li gel ku vala ye jî?

– Belê.

– Tişteki ecêb... ku vala be,
çawa dibe ku qîmeteke xwe î wu-
sa heye? Ku di hundurê wê de
tişteki bi qîmeta xwe tunebe?

– Ev nakeve serê me. Ma tu
nikanî ji me re îzah bikî?

– Hertişt nayê îzahkirin. Tenê
welê ye û ewqas.

Şivan bêdeng man. Çavên
wan ên cidî û hinekî westiyayî
li ewî tiştê li ser sîngê ew î pîr
bû, tiştê ku di nava pirça sipî
de daliqandî. Lê wan êdî tişteki
nepirsîn. Tenê ji wan yekî di ber
xwe de bi dengêki nizim got:

– Belê, belê. Rast e. Gelek tişt
hene ku nayêne îzahkirin. Tenê
her weke xwe ne.

Hec Mêrko

Hızır Akbina

Navê wî yê rast Mîrze bû lê, tu kesî wek Mîrzê nedizanî. Ji zarokan de bigire heta mezina bi wî re digotin Mêrko. Va nava dema zarok bû û hevalên xwe lênaye.

Mêrko mezin bû û zewicî, çend salan bi şunda jî carek din zewicî. Kesekî xizan jî bû. Dema ku li gundê wî dibistana serete vekirin, xedemetî dane wî.

Dema ku wî li dibistana gund dest bi kar kir, zarok gelek şabûn. Bi Mêrko re digotin xalê Mêrko.

Mamosteyên ku li gund kardikirin jî bi navê wî yê Mêrko bange wî dikirin. Di nav wan de jin jî hebûn. Rojekê di dibistanê de mamosteyeka jin bangî wî dikir û digot; “Here Mêrko, were Mêrko! Kar nişanî wî dida” Yekî ji wan mexlîman ku kurdî dizanî û got; “Mamoste Xanim, hûn dizanin hûn çî dibêjin?” mamoste got;

– Çî dibêjime ez?

Mamoste jê re eşkere kir ku manaya mêrko “mêr ê min e” Mamosta jîn lê qirîya got;

– Tu fedî nakî du jinên te jî hebûne!

Rojekê valîyê bajêr hatîyê gund, Mêrko wek pêşvaz tere û xwe dide nasandin;

– Ez pasevanê (bekçî) gund Mêrko me!

Gundî li dor alîyê valî dicivin. Di navberekê de tiştek gereg dibe û valî dibêje;

– Mêrko, tu li ku yî? gundî hemû bi hev re dikenin û kesên bi valî re hatîn tiştekî fehm nakin û li çavên hevûdu mezedikin. Yek ji wan tê, di guhê valî de dibêje; Xwedê te biparêze, mazallah gundî te şaş fahm dikan û mesela Mêrko jê re eşkere dike.

Valî hema di cî de emir dide ku Mêrko ji vazîfa pasevanîya gund bidûrxin.

Sal derbas dibin, Mêrko kal dibe û teqawîdbûna xwe dixwaze. Dibe xudanê mal û milk. Biryara xwe dide û dixwaze here hec. Xwarinekê dide gundîyên xwe û helalîya xwe dixwaze. Mixtarî gund li ser nanê bangî gundîyan dike û dibêje; “Cîranên hêja, êdî ji hîro bi şunda navê Mîrzeyê me ne Mêrko ye. Navê wî Hec Mîrze ye. Ma heca te bi xêr be.”

Ew roj tê û Mîrze tere hec û vedigere gundê xwe. Gundî terin serlêdana wî. Gîştika navê wî yê nû jî bîr jî kiribûn. Her kesê xurme dixwar û ava zezemê vedixwer, digot; “Hec Mêrko ma heca te bi xêr be!”

Sed sal derbasbin jî, Mêrko

Mêrko ye. Mîrze Mîrze ye.

Ji çarînên Omer Xeyam

Wergera ji farisî: Ehmed Mîlan

< natirsî, ey pîremêr
Digot kerema Xwedê ye,
meyê vexwe, bêdeng û lal bit

Ser dema¹ dewranê² ji xelkê dişerme
Ku di xema eyamê da rûniştîbû dilteng e
Meyê vexwe tu cama biriqî³ da bi nalîna çengê ra
Berî hînga ku neynik⁴ ji kevira bikeve

Ji corma⁵ herîya reş heya berztirîn seyirêka zohelê⁶
Sercema dijarîyan bi tevahîyê ê hel bibe
Vebikim bendên⁷ mişkila bi fêl û hîlan⁸
Her bend hate vekirin lê xêncî benda ecelê

Kesekî nemir bimîne cîhan da me nedîtiye ey dil⁹
Divên ji wê cîhanê hatî û gihîştîye ey dil
Hêvî û tîrsa me bi tişteki ye ku ji wê
Xêncî nav û nîşanî ne diyar e ey dil¹⁰

-
1. Serdem: rojan, rojgar, rûzgar, eyam.
 2. Dewran: zeman, zemanê, rojgar.
 3. Cama biriqî: mîna neynika û avgîne û şûşe, cama şûşeyî.
 4. Neynik: awêne, ayîne, avgîne, abgîne, cam û şûşên zerq û berq.
 5. Corma: rengê xaliasê, der seda pîvanê, xeta.
 6. Zohel: seyrêk û estîra paşî mo;terî, mezinîya zohel yan keyvan 700 zevî ye.
 7. Bend: gîlî û gazinde, dijar, meşxele, girêka kor.
 8. Fêl û hîle: komçî, hîlekar, fêlbaz.
 9. Mebest yanî her kesê di vê cîhanê da ê bimire.
 10. Di vê dunyayê da feqet "nav û nîşan" dimîne.

Bi ser û qameta¹¹ tazetir ji xermena gulê
 Ji dest nede cama meyê û dawa gulê
 Ji wê pêştir ku ji nişkava dibe bayê¹² ecel
 Kirasê emrê me wek kirasê gulê

Eger ez ji meya moxanê¹³ mest im, hemim¹⁴
 Eger kafir¹⁵, kibr¹⁶, bot perestim, hemim
 Her tayfek li ser me gumanek¹⁷ wan heye
 Ez ji wan çi bim ku ew im û hemim

Ez meyê ne ji bo tengdestîyê¹⁸ naxwim
 Yan jî xema rezîlî¹⁹ û mestîyê naxwim
 Ez meyê ji bo xatirê dilxweşîyê dixwim
 Nuha ku tu ber dilê min rûniştî naxwim

11. Qamet: bejn, bejna bilind.

12. Bayê ecel: ecel wek ba tê.

13. Moxan: rihspîyê aqilmendê zerteştî, meya moxan:
 meya pak û helal a li gor moxanan.

14. Hemim: ez hemim, heme, tu me çi bibêjî hemim, heya gawur.

15. Kafir: gawur, moşrik, xwedê nas nake, ateîst.

16. Kibr: kibriya, morîdê ayîna zerteşt e, mecûs, li gor ayîna îslamê kibr, mecûs û zerteşt kafir yan gawur tên hijmartin û heqaretek mezin e ji bo ayîna zerdeşt.

Li gor îranîyan, zerdeştî dinê resmî û rûmet û hurmetê ye.

17. Guman: xiyal, vehm. Şibhe û şik, fantazî.

18. Tengdestî: destê teng, naçar, bêçare, tengdestiya jiyanê, tunebûn.

19. Rezîl: bêrûkirin, riswa, nakesî, namerdî.

Romana


Sîbera şeva tarî

Alî Çiftçi

Ev romana nû ya Dehsiwar rewşa bakurê welêt û Tirkîyê ya ji salên 80î vir ve radixe ber çavan. Li ser koka bûyeran û herweha zehmetiyên ku rejîma totalîter li ser civakê çî tesîr kiriye, di şert û mercên jiyana sê kesên ji deverên cuda û bi temamî xwedînerînên cuda ne, tîne ba hev ku li bajarê Batmanê dijîn.

Ferhad kurê malbateke dewlemend e ku li devera Batmanê xwadîgotin e. Piştî wefata bavê xwe serkêşîya malbatê dike. Malbat têra xwe mezin e û ji çend xwişk û birayan pêk tê ku çend zarok û xizmên wan jî hene. Li herêmê baş tîna naskirin û li bajêr xwedîyê bandoreke mezin in. Hejmara endaman ji çendsed mêran zêdetir e û hema bêje bi qasî gelek mêran jî jin hene.

Piştî mirina bavê wî, apê wî yê duyemîn î mezin dixwaze serkêşîya malbatê bigirê destê xwe, lê apê wî yê din bi hev dike û biryarê didin ku Ferhad yê herî guncaw e ji bo rêbertîya



malbatê. Ferhad beşa aborî û hiqûqê xwendîye, li tevahîya herêmê bi piraniya malbatan re xwedîtêkilîyeke baş e û di karê bazirganîyê de jî gelekî jêhatî ye. Di destpêka serokatîya wî de karsazî û pêşengî pir baş derbas dibe û hertişt li gorî planê dimeşe.

Piştî demekê pismamê wî yê bi navê Sebrî li herêmê bi hêzên tarî re kar dike. Di nav wan de grubeka heye li heremê karên narkotîkê dikin. Sebrî bi wan re dikeve têkilîyê ku girêdayî hêzeka dewletê ya veşartî ye, bi sedan kurdên çalak ên siyasî li herêmê ji alîya vê grubê ve hatine qetilkirin.

Pismamê Ferhad tevî van hêzan hewl didin ku Ferhad bi-

kujin û bi qezayekê trafikê dest pê dike û di encamê de Ferhat bi giranî birîndar dibe û hevjin tevî du zarokên wî yên biçûk dimirin.

Ferhadê ku dawî ji nexweşxaneyê dertê, piştî qezayê hem pirsgirêkên wî yên fîzîkî hem jî yên derûnî çêdibin. Piştî ku Ferhad pirsgirêkên xwe tenduristiyê çêdibin, Sebrî dest datîne ser malbatê û dibe bazirganê herî mezin yê narkotîkayê li herêma. Malbata ku heta niha dûrî karê narkotîka û kiryarên siyasî bû, niha dibe yek ji mezintirîn malbatên sûcdar yên herêma. Tevî ku gelek ji malbatê rewşê hez nakin jî, lê cesaret û hêza wan têrê nake li hemberî wî bisekinin!...

Piştî vê bûyerê bi du salan dewlet ajanekeî dişîne herêma ku bi rêya peywendîya kurdên herêma bikeve nav tevgera kurd a siyasî.

Ajan dibe cîranê Ferhad û hewl dide pêwendiyê bi Ferhad re dayne û wî îqna dike ku ew bi malbata xwe re mêvaniyê bike. Piştî qezayê cara yekemîn Ferhad bi merîyan re derdikeve derve, têkildarî rêwîtiyê jî bi malbatê re dike, hevjin û xwişka ajan a bi

navê Nermîn re hevdîtinan pêk tîne. Di dawiyê de hezkirinek di navbera Ferhad û Nermînê de çêdibe.

Bi awayekî îronîk, hevdîtina wan a yekem bi pevçûneke hesûdî dest pê dike. Dema ku ajanê dewletê serxweş dibe, guman dike ku Ferhad li hevjinê wî yan jî xwişka wî dinêre. Piştî pevçûnê herdu jî dikevin ber polîsan û li wir bi komîserekî bi navê Cazim re tîn ba hev. Komîser Cazim piştî îfada wan digire, dihele ku ew herin mal. Ajanê ku navê wî Kerem e, wê êvarê tê mala Ferhad da ku lêborînê bixwaze, piştî demekê ev hersê kes dibin nasên hevdu û di demên cuda de li hev dicivin.

Dûre derdikeve holê ku hem ajan hem jî komîser bi eslê xwe kurd in û piştî ku dê û bavê wan di salên 1936-38an de hatine kuştin, li mal û dibistanên cuda hatine mezinkirin. Malbata ajan Kerem di komkujiya li Dêrsimê de hatibûne qetilkirin û tevî xwişka xwe û gelek zarokên din jî aliyê wezareta perwerdeyê ve hatibûne binçavkirin. Pêşî li malbatên tirk ên cuda de hatibûn bicîkirin û dema wexta wan a dibistanê tê,

ji bo hînkirinê û herwiha ji bo şuştina mejî ew birine dibistanên taybet.

Paşê, komîser Cazim jî hewl dide bi awayên cuda alîkarîya Ferhad û Kerem bike û hersê jî paşê dibin armanca dijberan ku dîsan hewl didin Ferhad bikujin û ekîbekê bişînin mala wî, lê di êrîşê de xwişka ajan Nermîn tê gulebarankirin. Piştî demêke kurt êrîşeke din li hemberî komîser Cazim tê kirin û ji bo vê carê bi giranî birîndar dibe. Piştî hîngê jî, ew dê bi hev re kar bikin da ku xwe biparêzin, û pismam û serkirdeyê rêxistina neqanûnî yê Jîtemê bi çend kîlo eroîn û pareyên reş digirên.

Roja din pismam û serkirdeyê Jîtemê tîn berdan û biryara tolhîlanînê didin. Şevêkê dema ew hersê heval ji bo serkeftina xwe pîroz bikin li hev dicivin, pismam bi çeteyên xwe êrîşî malê dikan. Komeke mafyaya narkotîkayê ku ji êrîşkerên koma

sivîl pêk tê, ji her du aliyan ve guheryan li wan dibarînin. Hersê jî di dema êrîşê de bi gelek fîşekan bi giranî birîndar dibin, herwiha pismam û gelek hevalên wî jî giran birîndar dibin. Di rêya nexweşxaneyê de hem ajan hem jî komîser tevî pismamê Ferhad û sê hevalên wî dimirin. Tiştê balkêş, hemû kurd in, hem yê mirin, hem jî yê ku dikujin.

Malbata Kerem, piştî ku polis Kerem û komîser Cazim li cîyên ku ew jê hatîne defîn kirin, hevîna Kerem tê mala xwe, xatir dixwaze û bardike Anqereyê. Nermîn pir xemgîn e û bi wê re naçe. Dema ku jinbiraya xwe bi zarokan re dikeve erebeyê bi hêstirên çavên xwe li wan dinêre. Ferhad li wê dinêre jê dervedixist bê ew nêrîna Nermînê dihat çî wateyê û xwe bêçare hîs dike. Lê herçiqas xemgînî giran xuya bîkîra jî wî tê da evîndarî û hêvîya dahatûyê jî didît...

DONATIONER
— VARA MED OCH BIDRA TILL BARNENS FRAMTID —
ALÎKARÎ
— TEVLÎ PÊŞEROJA ZAROKAN BIBIN —




Donera till
Stiftelsen Kurdên Anatoliya Navîn

0,00
SEK

☐ Gör det här till en månatlig donation ?

Donera med PayPal

Donera med ett betalkort



123 356 67 91

Swish-nummer



TEKILÎ / KONTAKTA OSS
Mjölmarstigen 1, 163 41 Spånga,
Stockholm, Sweden
Telefon: 0708 32 39 58
E-mail: info@stiftelsenkan.com

Hevkarên me / Våra samarbetsparner



Södra Stockholms
Folkhögskola



ABF Botkyrka-Salem